Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1344 | 21-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Yek ji berxwedêrên Şêxmeqsûd û Eşerfiyê; Harûn Nemir

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Di êrişên li ser taxên Şûxmeqûd û Eşrefiyê de Hêzên Ewlekariyê Hundirîn û gelên taxê berxwedaniyeke bêhempa meşandin, yek ji wan berxwedêrên serdemê ku heta kêliya dawî li ber xwe da, Harûn Nemir e.**

Çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê, bi piştgiriya dewleta Tirkiyeyê, di 6'ê Çileya 2026"an de êrîşek li ser her du taxan dan destpêkirin. Wan di êrîşa xwe de 42 hezar çete tevî bi dehan tank, top, dron û balafirên keşfê bi kar anîn. Lê ew nekarîn îradeya gel û şervanan bişkînin.Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê, ku li hember dorpêça 12 salan li ber xwe dan, vê dawiyê li dijî çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê berxwedanek efsanewî nîşan dan. Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên her du taxan heta dawiyê parastina niştecihan kirin, fedakariyên mezin kirin û çalakiyên fedayî pêk anîn.

Têkoşerê Kurd Harûn Nemir li kêleka fermandar û şehîdê rûmetê Ziyad heleb, di berxwedaniya li dijî êrişên çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê bû. Fermendar Ziyad Heleb biryara man û nemanê da li dijî êrişên bi ser wan de dest pê kiribûn û Harûn Nemir jî li kêleka wî berxwedanî kir. Wî ev biryar da piştî ku çeteyan li ser sivîlan bi awayek tund êriş kirin û di encama van êrişan çend sivîl jiyana xwe ji dest dan. Çeteyên Hikûmeta Demkî ên Sûriyeyê şerê taybet li ser wan dimeşandin ku wan sivîl qetil dikirin û ji wan re laşên wan dişandin, dixwestin bi vê hovîtiya ku dikirin moralê leşekeran bişkînin, lê Fermandar Ziyad Heleb bi 300 berxwedêran û yek ji wan Harûn Nemir li dijî van êrişan bûne bersiv. Harûn tevî temenê xwe yê biçûk tevlî vê berxwedaniya efsanewî bû ku bi vê berxwedaniyê bû nimûneyek mezin.



### 'Êrişên li ser Şêx Meqsûd û Eşrefiyê hertim berdewam bûn'

Harûn li ser destpêkirina êrişan wiha got: "Dema ku ez gihîştim wir, ez jixwe bi çekan dizanim û ezmûnên min hebûn ku hişt ez di xetên pêşîn de bim. Ez êdî ne ew ciwanê ku ji dengê çekan ditirsim, lê ev nayê wê wateyê ku ez ji tirsê bêpar bûm, ji ber cudahiya vê carê cih bû, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ne eniyeke dûr bûn, ew taxek bû ku kolanên wê min kevir bi kevir dizanibû. Ez li wir dijiyam, malbata min li vir dijiya û şer ji jiyana rojane nayê veqetandin."

### Kurdbûn bareke giran e

Şervanekî Kurd li Şêx Meqsûd ne hûrgiliyek biçûk bû. Tax bi piranî Kurd bû û her êrîşek dê ji bo sivîlan bibûya sedema karesatek rastîn. Ev hest berpirsiyariyê ji her şerekî ku wî berê kiribû girantir dikir. Ew ne tenê ji bo parastina pozîsyonekê şer dikirin, lê ji bo ku ew pêşî li dubarebûna dîmenên ku wan li deverên din dîtibûn bigirin. Ev fikar di her biryarê, her bicihkirinê û her şevekê de li ser nobedariyê hebû.

### Windakirin: Tiştê ku tu şer nikare tawîd bike

Harûn gelek hevalên ku wî li kêleka wan şer dikir winda kirin, hin ji wan wî berî şer nas dikirin û hinên din jî wî di dema şer de nas dikirin. Wan zû şehîdên xwe vedişartin, dû re vedigeriyan cihên xwe. Di şer de, dem ji bo xemgîniya tevahî tune, hûn wê paşve dixin, hûn wê hildigirin û hûn berdewam dikin. Ew şervanekî ku ji yekê zêdetir şer dîtiye, lê Şêx Meqsûd şopek cuda li ser wî hişt, ji ber ku ew ne xêzek dûr a eniyê bû, lê malek bû ku dizanibû malbata wî li pişt wî ye, diparast.

Harûn Nemir wiha dibêje li ser bandora êrişan li ser wî: "Ez şervanekî Kurd im, ev ne şerê min ê yekem bû, lê ew yek ji şerên herî hovane bû, ji ber ku ezmûna leşkerî bi tirsa mirovan, hesabên sar bi hestek kûr a aîdiyeta cihê re li hev kir. Ez wê vedibêjim ji ber ku şer, heta ji bo yên herî tecrûbir jî, birînên nedîtî dihêle. Û ji ber ku Şêx Meqsûd û Eşrefiye ne tenê beşek leşkerî di jiyana min de bûn, lê beşek jê ya neqetandî bûn."

Eşrefiye û Şêx Meqsûd ji ber rihê şoreşgerî yê şerê gel ku di her wateya peyvê de, di avakirina rihê şerê şoreşgerî de xwedî ne, bûne sembola berxwedanê. Û her kesê weke Harûn Nemir ku biryara parastina rûmeta xwe dan di dîroka kurdan de navê xwe neqişandin.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER RIZGARIYA JI BELAYÊ**

**Ji ser çavê xwe avêt:**
- Belaya wî ji xwe vekir; xwe jê rizgar kir.

**Qey me nanek daye feqîran:**
- Dema yek ji belayekê rizgar dibe dibêje.

**LI SER QÎMET Û GIRÎNGIYÊ**

**Axa wir zêran tîne:**
- Cihekî pir hêja ye; cihekî bi xêr û bêr e.

**Axa wir zêr e:**
- Bi heman wateyê.

**Axa wir bizêr e:**
- Bi heman wateyê.

**Bitovil e:**
- Gotinên hêja ne.

**Çêkir û mir:**
- Heta niha tişteke weke wê baş nehatiye çêkirin.
(Dema yek tiştekî nû dikire, bi henekî dibêje)

**Dema genim zer dibin, das biqedir dibin:**
-Di dema bikaranîna tiştan de, yan jî dema karê yekî dikeve cem yekî qîmetê wan çêdibe.

**Gotinên pêşiyan li erdê nakevin:**
- Pir girîng in; pir biqîmet in.
- Mirovekî mezin e, tikes nikare pê li gotina wî bike.

**Govend geriya li ber derê bavê zeriyê:**
- Kesê tişteke baş li cem hebe wê mirov li dorê kom bibin.

**Ji bo rojên giran e:**
- Ji bo dema tengayiyan e.

**Ji kevirê aş girantir nîne, bi mixekê radibe:**
- Qîmet û bihayê tiştan, yan kesan ne li gorî mezinbûn û giraniya wan e.

**Li ber çavan bigire:**
- Hesabê wî bike; wî ji bîr neke; bila haya te ji wî hebe.
Ma lîstika zarokan e?
- Karekî girîng e, ne karê henekan e.

**Mijara man û nemanê ye:**
- Yan emê tine bibin, yan emê bi ser bikevin.

**Mû bi mû rihek çêdibe:**
- Tiştên mezin ji kombûna tiştên piçûk pêktên.

**Mû û mû digire rû:**
- Bi heman wateyê.

**Piyana mîr li erdê ket, dengê wê li dinê ket:**
- Gotin, yan jî bûyerên kesên mezin yên herî piçûk jî dibin nûçe.

**Xwîna xwe daniye ser:**
- Di wê rê de, di ber de amade ye ku xwe bide kuştin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Esma Mistefa



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1344 | 21-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Kurdan bi berxwedaniya xwe destanên lehengiyê nivîsandin (1)



Ji berxwedana Kobanê ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê û heta berxwedaniya Bendava Tişrînê, gelê Kurd li hemberî hêzên tarî û dagirkeran destanên lehengiyê nivîsandin.**R-7**

## 'Kes nikare vîna jina Kurd bişkîne'



Rêveberiya Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin a Dêrik Ranya Efrîn diyar kir ku jina Kurd li hemberî her cûre êrişan serî netewand û teslîmiyetê qebûl nake, em Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin soza xwe ya tolhildanê nû dikin."**R-2**

## 'Divê Kurd bi hemû nêrîn û stratejiyên xwe bibin yek'



Siyasetmedarê Kurd û endamê KNK'ê Kamîran Berwarî da zanîn ku ew bi hemû hêza xwe piştevaniya sîstema Konfedralîzma Demokratîk û Rêveberiya Xweser dikin...**R-5**

# LI DIJÎ QIRKIRINÊ SEFERBERÎ

Di encama planeke navneteweyî de û ji bo têkbirina destkeftiyên Şoreşa Rojava û qirkirina gelê Kurd, bi hezaran çeteyên hikumeta demkî ku ji bermahiyên Qayidê û DAIŞ'ê pêktên êrişî Rojavayê Kurdistanê kirin. Li hemberî êrişên qirkirinê jî Rêveberiya Xweser û QSD'ê banga seferberiyê kirin. Piştî ragihandina seferberiyê gelê Rojava çek hilgirt û li kêleka şervanan cihê xwe girtin, gelê Kurd li tevahî Kurdistanê û cîhanê jî rabû ser piyan û banga parastina Rojava kirin.**R-3**




## 'Hikumeta demkî dibin navê Islama siyasî de kiryarên dijmirovî pêk tîne'



Rêveberê Mecilsa Olî ya bajarê Tirbespiyê Hogir Hesen eşkere kir ku hikumeta demkî ya Sûriyê li gorî berjewendiyên xwe islama siyasî bi kar tîne û got, "Hikumeta demkî ya Sûriyê dibin navê islama siyasî de kiryarên dijîmirovî pêk tîne."**R-4**

## Ji çiraxên hunera kurdî



Hunermendê Kurd Ferhad Bekendî çavkaniyek ji awazan e ku qet zuha nabe, buharek ji helbestan e ku qet naçilmise.**R-9**

## Xerîb Hiso: Yekrêziya Kurdan ne ji ber tirsê ye, istratejiyeke



Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku yekrêziya gelê Kurd ne ji ber tirsê ye, lê belê pilaneke istratejîk a Kurdan e û got, "Doza gelên Sûriyê û bidestxistina mafê wan pêktê dema ku doza gelê Kurd li Sûriyê çareser bibe. Herwiha niha bingehê kongreyeke netewî ya Kurdistanî amade ye, bila sala 2026'an bibe saleke Kurdistanî."**R-6**



**Mirovahiya bêwijdan**
Farûk Sakik R-4

**Sûriye û komploya piralî ya ku tê sazûmankirin**
Zekî Bedran R-4

**Koalisyona li dijî DAIŞ'ê hatî avakirin îro li aliyê DAIŞ'ê ye**
Erdogan Altan R-5



**Di civakê de pirsgirêka ziman**
Ehmed Hesen R-7

# ‘Kes nikare vîna jina Kurd bişkîne’

Rêveberiya Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin a Dêrik Ranya Efrîn diyar kir ku jina Kurd li hemberî her cûre êrişan serî netewand û teslîmiyetê qebûl nake, em Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin soza xwe ya tolhildanê nû dikin."

**Aryen Hesen/Qamişlo**



Di 6’ê Çile de êrişeke hovene ji aliyê çeteyên hikumeta demkî a girêdayî dewleta Tirk a dagirker ve bi ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê de hatin. Hemû cûreyên çekên giran li hember sivîlan bikaranîn û gel di nava gorpêçek mezin de jiyan kirin. Lê ji roja destpêkê ya êrişê de û haya roja dawî sekin û berxwedaniya gel dibû bersiv ji dijmin re. Herwiha dîsa careke din jina Kurd bi têkoşîn û berxwedaniyê xwe isbat kir. Hêza Ewlekariya Hundirîn a Jin bi israra xwe ya ji bo azadiyê û parastina gel bûn Fedayiyên şoreşê.

### ‘‘Dîroka berxwedaniya Şêxmrqsûd û Eşrefiyê xwe dubare dike’’

Ranye Efrîn diyar kir ku ew şahidê gelek şerê Helebê ye û wiha got: “Ji destpêka Şoreşa Rojava de ji 2012’an de êrişên hovane bi ser Kurdan de tên, şerê destpêkê yê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya bi pêşengtiya Şehîd Gulê Selma bû, dema ku êrişî taxê kirin xastin li ser destê Begariya Şerê mezin û parçebûnê di nava pêkhateyan de derbixînin, lê dîsa cereke din jina Kurd a bi navê Gulê Selma bersîvên tund da dijmin û gihaşt asta Şihadetê. Di vê demê de û di destpêka Şoreşa Rojava de gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li berxwedan. Bersivek mezin dan Rêjîma Baas û HTŞ’ê ve. Piştî wê şerê Heyanê yê girêdayî Helebê derket û dîsa careke duyemîn Şer li Heyanê derket, di wê demê de 22 rojan HTŞ’ê bi hemû tangên xwe êrişî herdu taxan kirin û di wê demê de em şahidiyê wê şerî bûn. Di wê demê de jî bi awayekî hovane êrişî ser sivîlan dikirin, mirov bi darê zorê koçber kirin, 22 rojan birîndar bê derman mabûn û Şehîd jî hebûn, Piştî wê jî em weke jinên Helebê ji bo parastina gerdu taxan me biryar da ku em tabûra Şehîd Gulê Selma di herdu taxan de ava bikin, 63’ê jinan cihê xwe di vê tabûrê de digirtin, ji jinên 60 salî heya yê 16 salî cihê xwe di vê tabûrê de girtin ji bo parastina axa xwe bikin. Di wê demê de Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bû keleha fikir û ramanê Rêber Apo, berxwedaniyê û kelaha hevaltiyê. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê fikirên azad ji Rêber Apo û şehîdan rakiriye û ji bo vê yekê taslimiyetê qebûlnakin û di rêya berxwedaniyê de meşiyan. Ji wê demê de û heya roja me ya îro qehremanên Şexmeqsûd û Eşrefiyê digotin emê şehîd bikevin û em xwe teslîm nakin û niha jî dîrok xwe dobare dike.”



### ‘‘Kes nikare vîna jina Kurd bişkîne’’

Ranye Efrîn destnîşan kir ku jina Kurd teslîmkariyê qebûlnakin û wiha domand: “Ji destpêka Şoreşa Rojava û ji şerê yekemîn a di Şêxmeqûs û Eşrefiyê de jina Kurd teslîmiyet qebûlnedikir û niha jî dîroka ku jina Kurd xwe têde isbat kiriye li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hat dobarekirin. Banga teslimiyetê li Heval Denîz hat kirin, lê qebûl nekir û xwe Şehîdxist herwiha bersivek mezin da herdu dewletan. Bi vê berxwedaniya xwe mohra xwe li dîrokê da. Cenaseya heval Denîz Çiye ji avahiya sêyem de avêtin erdê, ji canazeya jina Kurd ditirsin. Ji destpêka dîrokê de hewildidin ku vîna jina Kurd bişkînin û îradeya wê têk bibin, lê jina Kurd bi berxwedaniya xwe û israra ji bo azadiyê dikarîbû vîna xwe vijîn bike herwiha belav jî bike. Çiqas hewalbidin komkujiya bi gelê Kurd bikin, li beramberî wê hêza intîqamê li gel me zêde dibe.”

### ‘‘her ku diçe îradeya jina Kurd xortir dibe’’

Ranye Efrîn da zanîn ku îradeya jina Kurd nayê şikandin û wiha pê de çû: “Dijminê ku bi zihniyeta paşverû li hember jinê tevdigere, çiqas hewalbidin îradeya jina Kurd bişkînin, li beramberî wê her ku diçe îradeya jina Kurd xortir dibe, her ku diçe hêrsa me mezinrtir dibe û intîqama me zêdetir dibe. Ji destpêka dîroka Kurdan de hertim hewaldidin bi her awayî sekna bi hêz a jina Kurd bişkînin û ferasetа wê ya azadiyê têk bibin, lê tu carî jina Kurd dest ji xeta xwe ya berxwedaniyê bernedan. Di destpêkê de têkoşînê li hember zihniyeta zayendperestî dide meşandin û niha ji li hember zihniyata DAIŞ’ê tîkoşînê dide meşandin. Têkoşîna jina Kurd ne tenê ji bo Kurdane, lê belê ji bo tevahî jinên cîhanê ye.”

### ‘‘Soza me intîqame’’

Ranye Efrîn axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em soz didin hemû Şehîdên xwe û em soz didin hemû hevalên xwe çekên wan li erdê namîne, bi rihê intîqamê emê nêzî dijminê hov bibin, yê ku li ser destê wan hevalên me, fermandarên me û zarokên me, û qelê me tên Şehîd xistin. Em weke Hêza Ewlekariya Hundirîn a Jin soza xwe nû dikin herwiha soza intîqamê didin.”

# Rewşa Jin li Sûriyê

**Amara Baran**

**Sûriye ya ku bi salane bi şer, pevçûn û krîzên mirovî yên mezin re rû bi rû maye, ev rewş bi awayekî giran li ser hemû civakê bandor kiriye, lê yên ku herê zêde ji wî rewşê bandor bû û bûn qurban jin û zarok bûn.**

Berî destpêka şerê navxweyî di sala 2011-an de, jin li Sûriyê di nav şert û mercên pir dijwar yên civakî yên sînorkirî de dijiyan. Piştê ku pêla şoreşê di 19’ê Tîrmehê destpêkir û li tevahiya sûriyê û Bakûr û Rojhilatê Sûriyê belav bû, bi perwerdekirin û rêxistinkirina jinan her çiqas guhertinek hatibe çêkirin jî, lê hê jî ew zîhniyeta kevneşop ku li ser jin tesîrek daye avakirin. heta niha jî lê Mafên wan di gelek tiştan de hatiye sînordarkirin. ji 2011’an heta niha gelek jin bi gelek bûyer û kiryaran re rû bi rû man di her êrîşeke ku ji aliyê desthilatdaran ve li heremê dihatin meşandin de tundiya li ser jin xiraptir bû. Koçberî û penaberî li heremê bûye yek ji pirsgirêkên herî mezin. bi hezaran jin li ser axa xwe hatin koçberkirin û bi zehmetiyên koçbereiyê re rû bi rû ne. Em dikarin bêjin bi hezaran jin li ber çavê cihanê di bazaran de ji aliyê Çeteyên HTŞ’ê û DAIŞ’ê ve hatin firotin. Mixabin hemû dunya û kesên ku qaşo dibêjin em parazvanê jinên û parastina mafê mirovan dikin lê li hemberê van kiryaran sosret bêdeng man. Çawa ku Rejîma Baas jinan bê maf hiştibû îro jî “maskeya” ku Esaad avêtiye Colanî rakiriye careke din jin bi deste desthiladaran ve bê maf hatine hiştin û nedîtîve têne. kiryarên Colanî û çeteyên wî li ser jin didin meşandin mirov nikare nedîtîve bê li heremên Beravê û Siweyda bi hezaran jin hatin revandin û tecawûzkirin. Bi Tûndûtîya cinsî, zordarî, zewaca bi zorê re hatin hîştin. Ne tenê li Sûriyê an jî Bakûr û Rojhilatê Sûriyê jin dibin qurban li gelek welatan jin rastê her cûre kiryaran tê û di bin qurban, yê ku diparêze jî zilame yê dikûje jî zilame.

Di encamê de, rewşa jin li Sûriyê di navbera êş, berxwedan û hêviyê de ye. Pêşerojek aram û wekhev ji bo jinan pêwîstiya herê sereke ye ku jin ji bo parastina maf û azadiya xwe, xwedî roleke bingehîn. Bê parastina mafê jin li sûriyê aramî û hêvî ne mimkûne. Îro yên ku pêşengtî bikin û bibin xwedî hêz jin bixwe ye heta jin azad nebe azadî bê wateye.”

Li hember ewqas salên tijî kiryar û binpêkirina mafê jiyana jinan him di aliyê zagonî û hin jî di aliyê civakî de, lê ger em bala xwe bidinê di zêdetirî 14 salan li ser derbasbûna kirîza ku li Sûriyê bi taybet hatiye jiyankirin û hê jî didome. Jina Sûrî hê jî bêdeng maye! Gelo rûxmî ya ku herî zêde bûye qurbaniya van polîtîkayan jin e lê çima bêdeng e? Ma ew jî nikare bang bike û bêje para min jî ji vê kawosê, ji vê şoreşê û ji van guhertinan heye? Ev yek helbet ne tenê bi jina Sûrî ve girydayî ye, ev feraseteke hezar salî ye ku li ser hemû beden û rihê jinê hatiye meşandine. Jin di bin zihniyeta pergalên hegemon yên ji hezar salan ve hatiye avakirin de jiyan dike, ji wê zêdetir karekterê jina heyî dane avakirin. Ev yek pir bi polîtîk û bi zanebûn li ser mejî û rihê jina xwedewand hatiye meşandin. Bi derbasbûna hezar salan li ser van hişmendiyan re ku hêdî hêdî jina pêşengtî ji civakbûyîn û gerdûnê kiriye hatiye jibîrkirin û di mejiyê wê de hebûna jin a roja îro dane avakirin. Yanî bi kurtasî ji cewherê wê durxistin û bi demê re ew dan jibîrkirin da ku bi hebûna xwe ya heyî razî û bê guman e. Ev yek li ser hemû jinan hatiye meşandin. Em bala xwe bidinê di şoreşên ku li Rojhilata Navîn rabûne de, ji tunis bigre heyanî Sûriyê serîrakirina jinan ji bo daxwaza mafê xwe ya azadiyê nebû me nedît.. Balkêşe ku jin di guhertineke desthilatdariyê û sîstemê de, ranebe û rola xwe di van guhertinan de daxwaz neke. Gelo jin ewqas bê ziman e Helbet na. Lê ji ber siyaset û zihniyeta ku li ser hatiye mezinkirin, gihîştiye rewşa ku daxwaza mafê xwe neke, ya rastir ji ber dîktatoriya pergal û malbatê nikariye serî li qadên şoreşê û veguherînê rake.

Gelek jin di Sûriyê de rabûn ser piyan û mil bi mil bi zilaman re bûn yek deng; Gelo van jinan daxwaza azadiya xwe û mafê xwe kirin? daxwaza mosogerkirina deng û rola jin di zagon û hikumetê de kirin? Na. Ne gengaz e ku jin tenê dakeve qadan. Ma em ê ji jineke bi zihniyeta zilam û ji bo berjewendiyê zilam û dewletê dadikeve qadan çi jê bikin! ya girîng ev jin ji bo çi serî radike û ber bi qadên şoreşê ve diherike.



# piştperdeya biryara Trump a êrişa li ser Îranê

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê Donald Trump piştî demek ji gefxwarina êrişa li ser Îranê, ragehand ku ew ê di vê demê de operasyona leşkerî li dijî Îranê pêk neyine.

**Jîn Hisên**

Serokê Emerîkayê Donald Trump piştrast kir ku wî biryar daye ku êrişa leşkerî ya plankirî ya li dijî Îranê betal bike û tekez kir ku ev biryar wekî însyatîfeke wî ya kesayetî hat, ne ji ber zextên derve an navbeyankariyeke navdewletî ye.

Serokê Emerîkayê eşkere kir ku rayedarên Îranê darvekirina zêdetirî 800 kesan ku hatibû plankirin rawestandiye, ev gav wekî faktorek diyarker di biryara wî de dîtiye û wiha zêde kir: “Ew ê duh zêdetirî 800 kesan darve bikirana û ez rêzê li biryara wan a betalkirina wê digirim.”

Piştî hefteyekê tijî gef û aloziyên leşkerî, xuya dibû ku wê herêm li ber pevçûnek eşkere ya Emerîka-Îranê derbas biba. Serokê Emerîkayê Donald Trump biryarek ecêb da, ku êrişa leşkerî ya li ser Tehranê pêk anîba betal kir, ev kêlî di Washingtonê de wekî biryareke herî hesas hat wesifandin ji destpêka vegera wî ya Koşka Spî.

Li gorî hin çavkaniyên herêmî hate eşkere kirin ku hin hewildanên dîblomasî di demên dawî de hatin kirin, ji bo kêmkirina rageşiya di navbera Îran û Emerîkayê de, piştî hişyariyên ji nêz ve bi pêkanîna êrişeke leşkerî ya Emerêkî li dijî Îranê.

Li gorî Financial Times, pênc çavkaniyên nêzîkî hikûmetên Rojhilata Navîn gotin e ku rêze têkilî, hin ji wan rasterast di navbera Washington û Tehranê de hatin kirin, ji bo kêmkirina aloziya di navbera her du welatan de, di demekê de ku herêm li ber pevçûnek xeternak ve diçû.

Di heman demê de rojnameya New York Times, li gorî ku ji rayedarekî payebilind ê Emerîkî girtiye, hat eşkere kirin ku Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu di pêwendiyeke telefonî de ji Trump xwest ku her planeke gengaz a êrişa leşkerî ya Emerîkî li dijî Îranê betal bike.

Raportê diyar kir ku ev pêwendiya telefonî bi daxuyaniya Trump re hevdem bû ku wî agahî ji çavkaniyên pir giring ên li aliyê din wergirtiye, ku nîşan didin ku rayedarên Îranê dev ji kuştina xwepêşanderan berdane û bi darvekirinan berdewam nekirine.

Tevî van pêşketinan, rayedarê Emerîkî tekez kir ku Trump vebijarka leşkerî bi tevahî dûr nexistiye. Herwiha destnîşan kir ku serokê Emerîkayê hîn jî senaryoyên ku ji hêla rêberên leşkerî ve têne pêşkêş kirin dinirxîne û her biryarek pêşerojê dê bi wê ve girêdayî be ku dezgehên ewlehiyê yên Îranê çawa bi xwepêşandanên berdewam re mijûl dibin.

Di heman çarçoveyê de, malpera Emerîkî ya Axios ragihand ku Trump biryara dawî ya li ser destpêkirina êrişeke leşkerî li dijî Îranê paşve dixe, di demekê de ku Koşka Spî û hevalbendên wê li ser dema her operasyoneke muhtemel û şiyana wê ya bandorek rastîn li ser aramiya rejîma Îranê, di nav xwe de şêwir dikin.

### Hemû vebijark li ser maseyê ne

Ji aliyê xwe ve, Koşka Spî piştrast kir ku hemû vebijark hîn li ser maseyê ne. Berdevka Koşka Spî Carolyn Leavitt got ku rêveberiya Emerîkayê Tehranê agahdar kiriye ku kuştina berdewam a xwepêşanderan dê encamên wê yên cidî hebin.

Leavitt zêde kir ku serokê Emerîkayê ji rawestandina nêzîkî 800 darvekirinên agahdar e û tekez kir ku tenê komek piçûk di nav rêveberiya Emerîkayê de ji hûrguliyên planên derbarê Îranê de agahdar bû.

### Zêdebûna aloziyê û şandina nameyan

Di nav çend rojan de, Trump asta gotinên xwe gihand asteke bêhempa, her cure hevdîtinên bi rêveberiya Îranê re betal kir û bi eşkereyî bang li xwepêşanderên li hundirê Îranê kir ku rejîmê hilweşînin, di heman demê de îşaret bi piştgiriya bilez a Emerîkayê kir. Ev yek bi nîşanên li pey hev ên amadekariyên leşkerî yên berfireh re hevdem bû, vê yekê nîşan da ku pêkanîna êrişê meseleya demê ye ne zêdetir.

Ev rewşa aloziyê ku li ser tevgerên meydanî nîşan da, di nav de jinûve bicihkirina hêzên Emerîkayê, xurtkirina hebûna deryayî û hewayî li herêmê, di dîmenekê de ku destpêka aloziyên leşkerî yên berê ku bi şer bi dawî bûn, anî bîra mirovan.

### Amadekarî qediyane

Li pişt perdê, serokatiya leşkerî ya Dewletên Yekbûyî li ser wê texmînê bû ku di nav çend demjimêran de biryarek siyasî dê were dayîn. Tevgerên lojîstîkî, valakirina qismî ya baregehên hesas û xurtkirina pergalên parastina mûşekî hemî asta cidîbûna amadekariyan nîşan didan.

Di hundirê odeya biryardanê de, Trump nirxandinên cuda yên li ser zêdebûna rageşiyê guhdar dikir. Berpirsyarên leşkerî hişyarî dan ku her êrişek her çend jî bi lez û biryradar be, dê qelskirin an hilweşandina rejîma Îranê garantî neke û dikare derî li ber reaksiyonek bi rêz veke ku kontrolkirina wê dê dijwar be.

Li gorî wan nirxandinan, aliyê herî xeternak ew e ku Washington di wê gavê de wê nikaribe bikeve pevçûneke dirêj, di heman demê de parastina hêz û hevalbendên xwe misoger bike, nemaze di ronahiya tora bandora herêmî ya Îranê de.

### Gefên devikî bûn bandoreke neynî

Trump bi bilindkirina asta gefan bi awayekî eşkere, xwe xist ezmûneke baweriyê, her çend peyamên tund ên ku ji Tehranê re hatine şandin jî, nehiştine ku desthilata rejîmê qels bibe, lê belê rayedarên Îranê zordarî zêdetir kir, da ku li ber her hewildanên ku deriyê her destwerdaneke biyanê rê bigre.

Çavdêr dibînin ku ev gurbûna gefên devikî bandoreke berevajî çêkir, ji ber ku rejîma Îranê bi lez xwepêşandanan tepisand berî ku bibe kaxizeke zextê di destê Washingtonê de.

### Nîgeraniya li ser tenêhiştina xwepêşanderan

Li Washingtonê, fikar derketin holê ku teşwîqkirina eşkere ya xwepêşanderan, bêyî amadebûneke rastîn ji bo destwerdanê, dibe ku wan bi zordariyê re rû bi rû bihêle. Ev fikar ne tenê exlaqî bû, lê di heman demê de siyasî jî bû; weke ku tê şîrove kirin, ji ber ku têkçûna xwepêşanderan dê rasterast bandorê li ser wêne û bandora Dewletên Yekbûyî bike.

Hin dengan di nava rêveberiyê de dîtin ku berdewamiya bi gefê bêyî bicîhanînê, an jî bicîhanîna bêyî stratejiyeke derketinê, her du jî vebijarkên buha ne.

### Gaveke bêdeng a veguherînê

Xîtaba Trump hat guhertin, zimanê tund a êrişeke nêzîk winda bû, nîşaneyên mîna peyamên ne rasterast derket tê destnîşan kirin ku darvekirin hatiye rawestandin, bi belavbûna van nîşaneyan, Trump hisabên xwe vegerand û biryar da ku rêya êrişê rawestîne.

Guhertin di yek carê de nehat ragihandin, lê belê hêdî hêdî bi rêya daxuyaniyên kurt derket holê, berî ku paşê were piştrast kirin ku vebijarka êrişê hatiye cemidandin.

### Rewşa Îranê di xwepêşandanan de

Çalakvanên hiqûqî raghandin ku zêdetirî 3 hezar kes di xwepêşandan de hatin kuştin, di heman demê de tomarkirina çalakbûna di Enternêtê de piştî ku qutbûna wê demekê berdewam kir, li gorî ku Reuters raghandiye.

Rêxistina mafên mirovan HRANA ya navenda wê li Emerîkayê ye, raghand ku wan kuştina 3090 kesan lêkolîn kiriye, di nav de 2885 xwepêşander in, niştecihan diyar kirin ku hemleya tepisandinê bi awayekî mezin xwepêşandan rawestand, di heman demê de medyaya fermî ragihandin ku girtinên zêdetir çêbûne.

### Ji bo bidawîkirina hukmê Melayî xwepêşandan li dar ketin

Xwepêşandan di 28’ê Kanûnê de, li hember paşxaneya pirsgirêkên aborî dest pê kirin û veguherin xwepêşandanên berfireh ji bo bidawîanîna desthilatdariya Melayî li Îranê, ku di dawiya hefteya borî de bi tundûtûjiyek berfireh gihîştibû lûtkeyê.

Serokê Emerîkayê Donald Trump gefeke tund li Îranê xwaribû ger xwepêşanderan bidarve bike, lê piştre ragihandi ku rêberên Tehranê dev ji fikra bidarvekirina girseyî berdane.



# Projeya Rêveberiya Xweser projeyeke exlaqî û polîtîk e

Rêveberiya Xweser ji despêka damezrandinê ve û heta niha parastina mafê hemû netew, ol û pêkhateyên herêmê dike. Armanca wê ya sereke jî pêkanîna demokrasî, wekhevî û edaletê ye.

**Biruc Resûl/Qamişlo**




Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê berî ku Rêveberiya Xweser bê avakirin, di pêvajoyên giran û dijwar re derbas dibûn. Mafên wan ên rewa hatibûn çewisandin û nasnameya gelê Kurd û zimanê Kurdî nedihat qebûlkirin. Ev tev jî di encama desthilatdariya yek reng û navendî de bû. Lê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk dikaribû bibe deng û îradeya gelê herêmê da ku di nava ewlehî û aramiyê de bijîn û mafên xwe yên jiyanî bidest bixin. Her gavek ku Rêveberiya Xweser îro davêje, mîrasa şoreşa 19'ê Tîrmehê ye ku bi şoreşa jinê tê pênasekirin. Yek ji destkeftiyên vê şoreşê ew e ku her netewek bi ziman û nasnameya xwe dijî, herwiha di dibistanan û qadên perwerdehiyê de jî her pêkhateyek bi zimanê xwe dixwîne.

Di 2014`an de pergala Rêveberiya Xweser li her sê kantonên Efrîn, Firat û Cizîrê bi armanca hembêzkirina hemû pêkhate û gelên herêmê, ji bo rêvebirina civakê ya bi deng û nêrîna gel, hata avakirin. Gel dikare xwe bi xwe bi rêve bibe, ji komînan bigre heya meclîsan. Girîngiya Rêveberiya Xweser ew e ku ji ber bi salan e gelê herêmê hatibû bişaftin û tunekirin, bi taybetî gelê Kurd ê ku bi siyaseta qirkirina çandî, aborî û civakî re ji aliyê sîstema Baasê re rûbirû diman.

**Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê**

Di 21'ê Çileya sala 2014'an de piştî tekoşîneke mezin a bi salan Rêveberiya Xweser li kantona Cizîrê hate avakirin. Rêveberiya Xweser yekem car li Cizîrê hat damezrandin, paşê li Efrîn, Kobanê û hwd… Di destpêka damezirandina vê rêberiyê de gelek êriş li serê hatin kirin û bû hedefa dewletên hegemon û desthilatdar. Rêjîma Baas hewl da ku Rêveberiya Xweser têk bibe û dewleta Tirk dest bi êrişî Rojava kir û bi riya DAIŞ'ê xwest Kobanê dagir bike. Piştî lewazbûna rêjîma Baas ku di wê demê de hemû saziyên wê ji xizmetê derketin û şoreş dest pê kir, êdî hewce dikir ku civak di hemû waran de xwe bi rê ve bibe. Rêveberiya Xweser di encama berxwedaniya gelan a li dijî zilmdariya rêjîmê ava bû. Wekî tê dizanin ku rêjîma Baas siyaseta desthilatdarî, istixbaratî û navendbûyînê dida meşandin. Lê civakê li hemberî vê sîstemê li ber xwe da û dest bi rêvebirina xwe kir. Lewma jî gel bi hemû pêkhateyên xwe ve, partiyên siyasî, sazî û tevgerên jin û ciwanan li ser bingehê Neteweya Demokratîk derbasî qonaxeke nû bûn. Êdî serdema serweriya rêjîmê çû û bi fikrekî nû li ser bingeha sîstema demokratîk li hemberî sîstema netew-dewletê civakê xwe bi rê ve bir.

**Ji destpêka avabûne Rêberiya Xweser êriş li ser tên meşandin**

Rêveberiya Xweser bi dirêjahiya avabûna xwe ve rastî êrişan hatiye, di encamê de hin herêmên wê ketin bin sîwana dagirkeriya Tirk. Dagirkeriyê bi riya çeteyên DAIŞ û komên girêdayî xwe deverên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir. Hêzên desthilatdar di hemû waran de êrişî Rêveberiya Xweser dikin. Di destpêkê de êrişên siyasî hebûn, van hêzên desthilatdar dixwestin rêveberiyê û sîstema wê reş bikin. Her wiha van hêzan bi armanca têkbirina Rêveberiya Xwese, hertim didan xuyakirin ku Rêveberiya Xweser parçebûna xaka Sûriyê dixwaze. Di heman demê de hewldan hatin kirin ku danpêdaneke bi vê rêveberiyê li ser asta cîhanê pêk neyê. Di heman demê de ji milê aborî ve herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bifetisînin. Da ku Rêveberiya Xweser vala bihêlin û jêderên jiyana gelên me têk bibin. Sedema van êrişan jî ew e ku Rêvberiya Xweser xwedî projeyek demokratîk e û ev proje li dijî hêzên desthilatdar û hegemonîk e. Heta roja îro jî ev êriş bi tevahiya cureyên xwe ve li ser Rêveberiya Xweser û gelên wê tên meşandin.

**Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bajarê Kobanê**

Di 27'ê Çileya 2014'an Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bajarê Kobanê ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat avakirin. Ev proje ji bo pêkanîna yekbûna gelê herêmê û misogerkirina maf û nasnameyên wan hat avakirin. Projeya Rêveberiya Xweser ji gelê herêmê re û ji aloziya Sûriyê ku parastina mafê hemû netew û mezhebên herêmê dike re bû rêya çareseriya demokratîk. Di Rêveberiya Xweser de yek ji bendên herî girîng, piştevaniya bi jin û ciwanan re ye. Ji ber vê yekê ji avakirina komînan bigre heya pergala hevseroktiyê, jin cîhê esasî digire. Jin di nava xweseriyê de xwedî reng, raman û nasnameyek serbixwe ye.

**Rêveberiya Xweser a kantona Efrînê**

Her wiha damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Kantona Efrînê di 29`ê Çileya 2014 hat ragihandin. Kantona Efrînê di binê sîwana Rêveberiya Xweser de, ji aliyê siyasî, aborî, civakî û parastinê ve birêxistinkirî bû. Li ser hîmên biratiya gelan û pêkvejiyanê, tevna civakî dihat ristin. Ji ber wê Rêveberiya Xweser a Demokratîk ne destkeftiyeke gelê Kurd tene ye, destkeftiya tevahiya pêkhate û şêniyên Sûriyê ye. Bi ragihandina Rêveberiya Xweser re, ji ber ku malên gel in, sazî û dezgehên gel hemû ji rûxandin û texrîbatê hatin parastin. Saziyên ku li ser fikra şoven a rejîma Baas dihatin birêvebirin, ji nû ve hatin avakirin û li ser bingeha felsefeya nûjen a Neteweya Demokratîk hatin sazûmankirin. Her kes dizane ku rêjeya Kurdan li Efrîn 90% derbas dike. Lê ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser projeyeke exlaqî û polîtîk e, gel û olên li Efrînê dijîn tev hewandin nava xwe. Her aliyek, çi partiyên siyasî, pêkhate û çi jî olên cuda dibin, hemû jî di Rêveberiya Xweser de bûn xwedî rol û misyon.

**jiyana demokratîk bi kêrî rejîmên desthilatdar ên Baas û AKP`ê nehat**

Gelê Efrînê gelekî têkoşer û xwedî îrade ye. Bi keda xwe rêveberiya xwe ava kir. Ji ber ku Efrîn herêmeke çandiniyê ye, civaka Efrînê jî xwedî sebir û saman e. Çawa ku bi salan xizmeta darên zeytûn, hinar û fêkiyan dike, bi heman hezkirinê jiyana hevbeş ava kir. Bi avakirina Komîn û meclîsan dest pê kir. Pişt re jî, sazî û dezgehên xwe yên Rêveberiya Xweser ava kirin. Ev şiklê jiyana demokratîk bi kêrî rejîmên desthilatdar ên Baas û AKP`ê nehat. Ji ber vê yekê jî her li firsendekê digeriyan ku vê destkeftiya gelan biherifînin û têk bibin. Li ser van bingehan êrişên dagîrkeriyê yên 20`ê Çileya 2018'an dest pê kirin. Her wiha dewleta Tirk a dagirker nexwest ku pirojeya Rêveberiya Xweser belav bibe, ji ber wê her ku ro derbas dibû êriş li ser Efrîn zêde kir, heta ku Efrîn û gelek bajarên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagirkir. Tenê ji bo ew pirojeya Rêveberiya Xweser têk bibe û negihîje armanca xwe.

**Têkoşîna kurdan û guhertina dîrokî**

Gelê Kurd bi têkoşîna dijwar, rêxistin û şehîdbûna bi hezaran zarokên xwe azadiya xwe bi dest xist. Îro, Kurd ku ji sedsalek tecrîdê derbas dibin, dixwazin bi hişmendiya xwe û hêza xwe statuyê bi dest bixin. Lê belê dewleta Tirk, bi sekinandina li kêleka bermahiyên DAIŞ û çeteyên HTŞ'ê, hewl dide ku mafên herî bingehîn ên Kurdan ji holê rake. Lê wan tiştek ji bîr kiriye: ew gelên ku duh hatibûn paşguhkirin, îro wekî hêzek rastîn wek rojê li ber wan radiwestin.

**Encam**

Paşeroja Sûriya nû ne diyar e. Lê belê, tiştek diyar e: Kurd êdî ne heman Kurd in. Ew bûne yek ji mijar û aktorên herî girîng di pêvajoya veguherîna Rojhilata Navîn de. Tevî hemû zextan, Rêveberiya Xweser ber bi bûyîna beşek yekgirtî ya avahiya siyasî ya pêşerojê ya Sûriyê ve pêşve diçin. Gelên Rojava û Sûriyê piştî têkçûyîna çeteyên DAIŞ'ê, rizgarkirina kantonên Reqa, Dêrazorê û hwd… bi hev re Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava kirin. Ev projeya ji bo pêşeroja Sûriyê bû mînak, Sûriyeke ku hemû alî hev bipejirînin û bi hev re wekhev bijîn. Her wiha mafê tevahiya gelên Sûriyê di destûreke demokratîk de parastî be. Piştî hilweşandina rêjîma Baas êdî projeya Neteweya Demokratîk riya çareserkirina kirîza Sûriyê ye. Ev bûye 12 sal ji damezirandina Rêveberiya Xweser, ev proje ji hêla gelên Sûriyê li hemû parêzgehan berbiçav tê girtin û êdî bala wan tê kişandin. Hêjayî gotinê ye ku ev rêveberî sal bi sal mezintir û bi hêztir bû, hemû gel jî di nava vê rêveberiyê de cihê xwe girtiye. Her pêkhateyek bi ziman, çand û baweriya xwe dijî û xwe bi rê ve dibe û armanc ew e ku ev piroje ji bona tevahiya Sûriyê bibe riya çareseriyê. Êdî li ser bingeha demokrasiyê hemû pêkhate, kurd, ereb, suryan, çerkes û hwd… xwe bi rê ve bibin û bi hev re bi aramî bijîn.



# Bêbextî ji HTŞ'ê çêbû, berxwedanî û hevrêziya gelê Kurd pêkhat

Li Rojavayê Kurdistanê derheqê gelê Kurd pilanên qirkirinê bi destên HTŞ tê meşandin, li hemberî vê yekê bêdengiya navdewletî tê nîşandan. Lê gelê Kurd li tevahiya cîhan û Kurdistanê piştgirya xwe ji bo Rojava û berxwedaniya gelê Kurdan ji bo serkeftina şoreşê didin misogerkirin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Bêbextî ji Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pê bû**

Çîroka bêbextiya hikumeta HTŞ'ê li gelê Kurd ji binpêkirina peymana 1'ê Nîsanê dest pê bû, ji geşedanên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê. Dema ku êrişên çeteyên Tirkiyê û Colanî li ser Şêxmeqsûd û Eşerefiyê hatin destpêkirin, herwiha peymana 1'ê Nîsanê bin pê kirin. Rast e peymana 1'ê Nîsanê di navbera QSD'ê, Rêveberiya Xweser û hikumeta HTŞ'ê de hate îmzekirin, lê bi erêkirina hêzên weke Amrîka û Tirkiye bû. Mercên peymanê ew bûn ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn ango Asayîşa her du taxan bi hevkariya hêzên ewlekariya hikumeta HTŞ'ê ewlehiyê biparêzin, di heman demê de gelên wê xwe bi rê ve bibin. Lê di necama bêbextiya HTŞ'ê, êrş li ser gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê çêbû û komkujî li ser gelê Kurd pêkhat. Hêzên navdewletî yên ku piştgiriya peymana 1'ê Nîsanê dikirin, bêdeng man, ji xwe dagirkeriya Tirk di vî warî de destwerdneke herî xerab kir.

**Binpêkirina 10'ê Adarê û vejîkirina DAIŞ'ê**

Bêdengiya raya giştî û Amerîkayê li pêşiya her kesî bû, li Dêrhafirê ruxmî li hevkirin çêbûbû ku di navbera 48 seetan de QSD'ê ji wir vekişe, lê çeteyên dewleta Tirk û HTŞ'ê berî dema peymanê êrişî şervanên QSD'ê kirin. Li vir bêdengbûna Amerîka û hêzên hevpeymanî bû cihê şek û gumanan çêkirin ku êdî ew dane ser riya bêbextiyê. Li Dêrhafirê piştî lihevkirina her du aliyan û pêkanîna xalên peymana 10'ê Adarê, di encama êrişa ku li ser Reqa, Tebqa, Dêrazorê û başûrê Hesekê çêbû, tişta herî xeter rûda. Bi hezaran çeteyên DAIŞ'ê yên ku girtî bûn, li ser destê çeteyên HTŞ'ê rizgar bûn, yek ji van zindanan a Qetna ya li Reqayê, heta roja îro jî şervanên QSD'ê di dorpêçê de ne, di heman demê de çeteyên girtiyên zindanê tevlîheviyê çêdikin da ku derkevin û tevlî HTŞ'ê bibin, li aliyê din jî dewleta Tirk a dagirker bi firokên bêmirov zindanê di 19'ê Çile de hedef girt. Navenda Ragihandina Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyekê diyar kir ku girtîgeha Şedadê ji bin kontrola şervanên QSD'ê derketiye. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Ji saetên sibehê ve komên Şamê bi awayekî dijwarî êrişî girtîgeha Şedadê ya ku tê de bi hezaran endamên rêxistina DAIŞ'ê ya terorîst hene dikin. Şervanên QSD'ê bersiva van êrişan didin û gelek caran ew êriş têk birin. Ji bo karesateke ewlehî çênebe bi dehan şehîd û birîndar çêbûn.Tevî ku girtîgeha Şedadê 2 kîlometre ji baregeha Koalîsyona Navneteweyî ya li herêmê ve dûr e, lê gel bangên dubare baregehê destwerdan nekir.

**Banga Heyva Sor a Kurd ji bo koçberan**

Heyva Sor a Kurdistanê ji bo alîkariya malbatên di encama komkujiyên HTŞê de koçberî Kantona Firatê bûne banga alîkariyê kir. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Di encama komkujiyan de bi sedan sivîl hatin qetilkirin. Herwiha bi deh hezaran jî bi zorê hatin koçberkirin. Niha mafê jiyanê yên bi sed hezaran Kurdî di bin talûkeyê de ye. Ji ber êrişan pêwistiya xurek, av, ceyran û lazimiyên jiyanî derketiye holê." Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku Heyva Sor ji bo alîkariya Rojava bi sazî û dezgehên navneteweyî re qampanyaya alîkariyê daye destpêkirin û ev bang hate kirin: "Hûn jî dikarin alîkariya vê qampanyayê bikin û emê alîkariya bigihînin Rojavayê Kurdistanê. Di serî de Kurdistaniyên li dîasporayê divê hemû kesên xwedî wijdan tev li qampanyayê bibin. Ji bîr nekin her alîkariyek dê li Rojava jiyanekê xilas bike. Ji bo Rojava dema ku herkes bikeve nav liv û tevgerê ye."

**HPG piştgirî da Rojava**

Fermandarê HPG'ê Mûrat Karayilan derbarê êrişên li ser Rojava wiha got: "Gelê me yê Rojava bi welatparêzî, berxwedan û ruhê xwe yê neteweyî gelek tişt hînî me kir. Berdêla xwe çi dibe bila bibe em ê we tenê nahêlin. Gelê Kurd û weke tevgera azadiyê em; çi pêwîst be em ê wê bikin."




Berxwedaniya Kurdistanî

Piştî komên çeteyan ên HTŞ, SMO û DAIŞê bûn yek û bi piştgiriya Israîl, Fransa û Tirkiyeyê êrîşî gelê Kurd kirin, li çar aliyê cîhanê bi milyonan Kurd tevî sazî û rêxistinên xwe seferberî îlan kirin û derketin qadan. Bi milyonan Kurd ji Silêmaniyê heta Hewlerê, ji Duhokê Heta Zaxoyê, ji Qamişlo heta Hesekê, ji Kobanê heta Dêrikê, ji Nisêbînê heta Dêralok û Şeladizê, ji Şengalê heta Mexmûrê, ji Wanê heta Amedê, Ji Mêrsînê heta Êlihê, ji Holandayê heta Almanyayê, ji Zûrihê heta gelek bajarên Ewropayê li hev kom bûn û ji bo êrîşên li dijî gelê Rojava şermezar kirin. Diheman demê de pêşmegeyekî dildar, li ser hesaba xwe ya medya dijîtal peyamek bi dîmen weşand û ev tişt anîn ziman: "Vaye em bi rê ketin bo Rojava. Ji bo me dua bikin. Hêvîdarin ku li Deriyê Sêmalka ji bo me rê dayîn. Ez wekî xwebexş diçin parastina şeref û kerameta Kurdiniyê bikim." Di 19'ê Çile de gelê Kurd li Niseybîna Bakurê Kurdistanê bi girseyî ber bi sînor ve hatin, bi dehan keç, xort, kal û pîr, deriyê sînorî yê Niseyîbîn-Qamişlo derbas kirin. Ew sînor û deriyê kilîtkirî li hemberî yekîtiya gelê Kurd nebû kelemek û hat vekirin. Di serê sibeha 20'ê Çile de gelê bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê ku şevê din li hemberî êrişên komên çete yên hikûmeta demkî ya Suriyê daketibû qadan ji bo destekdayîna berxwedanê ber bi Rojava ve hatin. Şêniyên ku li navenda bajar kom bûn, dirûşmeyên "Yeke yek yeke Kurdistan ye" berz kirin û bi karwanekî seyareyan ber bi Rojava ketin meşiyan.

# 'Pêwîst e mafê Kurdan di destûra Sûriyê de were bicihkirin'

**Viyan Egîd/Qamişlo**

**Pisporê zagonsazî Xalid Cebir diyar kir ku di 16`Çileya 2026`an de ji aliyê Ehmed El-Şeri biryarnameyek girêdayî gelê Kurd hat regihandin û wiha got, "Tenê mafê Kurdan wekî biryar ne têrker e, lê belê divê bi awayekî fermî mafê gelê Kurd bikeve destûra Sûriyê de."**



Serokkomarê hikumeta demikî ya Sûriyê Ehmed El Şeri, di 16`ê çileya 2026`an de biryarnameyeke bi hejmara 13'an ya sala 2026'an derxist ku qaşo hinek mafên Kurdan li Sûriyê eşkere kir û ragihand. Di vê çarçoveyê de Pisporê Zagonsazî Xalid Cebir ji Ronameya me re axivî.

**'Hikumeta demkî wê bibe sedema kirîzeke mezin'**

Xalid Cebir di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser êriş û kiryarên dijmirovî yên hikumeta demkî û wiha pê de çû: "Piştî 14`e salan ji şer û aloziya Sûriyê re, hikumeta demkî ya Sûriyê qaşo hat li ser desthilatdariyê da ku şer, pevçûn û aloziyan bi dawî bike, lê mixabin ji roja hatine vê hikumetê ji bilî komkujî, kiriyarên dijmirovî û qirkirina pêkhateyên me ne dît. Ev yek wê bibe sedem ku rewşa Sûriyê ber bi xerabûn û hilweşandinekî bingihîn wê bi de avakirin. Her wiha şûna ku hikumeta demkî bi aştî û demokratik bûyinê bifikre û di hundirê Sûriyê de pêk bîne, di heman demê de karî be ku hemî pêkhate û mafên wan bi parêze. Lê me dît ku çawa parçebûyineke mezin di hundirê Sûriyê de da çêkirin, bi vav kiriyar û rêbazan wê nikaribe Sûriyekî aram û bi ewle ava bike, berovajî wê Sûriyê wê her di nava şer û pevçûnên navxweyi be. helbet yê ku piştgiriya vê hikumatê dike jî û li dû van leystokane dewleta Tirk e, dewleta Tirk her dixwaze piroje û sîstema Rêveberiya Xwere û QSD`ê tune bike. Lê ev yek neyê qebûlkirin û tu carî jî armanca wê pêk nayê, ji ber ku nikarin baweriya gel bi hêza QSD`ê re bişkînin."

**'Mersûma ku ji bo mafê Kurdan hatiye ragihandin têrker nîne'**

Xalid Cebir di berdewamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Mersûma ji bo mafê gelê Kurd ku di 16`çile de ji aliyê Colanî ku niha bi nave Ehmed El-Şeri û serokê Şamê xwe daye nasîn ve hat ragihandin. Mersûm ji 7 xalan pêk hat. Lê di vir de gelê kurd wê çawa bawerî bide vê mersûmê ku heye roja îro êriş, kiryarên dijmirovî û komkujiyan li hemberî gelê Kurd pêk tîne, ev hikumet ne hikumeteke xwedî baweriye. Bi biryarên wiha ku ji bo gelê kurd bawer bikin, ev ne têrkere. Pêwîste di piratîka xwe de jî bawerî bide, da ku gelê Kurd bi biryarên mafdayina xwe di Sûriyê de bawer bikin, li vir Ehmed Seri dibêje ez mafê Kurdan didim wan û di heman kêliyê de êrişî wa dike. Ev ne gavek ango rêbazekî qnûnî û mirovî ye. Daxwazên gelê Kurd ew in ku sîstema nenavendî were avakirin, di heman demê de Sûriyayekî aştî û demokratîk were avakirin. Ji bo çareseriya şer û aloziyên Sûriyê ev yek pêwîstin. Kurd Sûriyek demokratîk dixwazin, dinava vê Suriyê de hemû beşên civakê dinava vê erdnîgariya Sûriyê de jiyan dike. Hemû bawerî bikarbin bi awayek azad jiyana xwe bi rêxistin bikin. Xwesteka gelê Kurd jî weke ya hemû gelên Suriyê ev e. Lewma divê ev xwestek di qanuna esasî ya Sûriyê de weke qanun bicih bibe û bikeve bin mîsogeriyek qanunî de."

**'Pêwîst e mafê kurdan di destûra Sûriyê de were bi cih kirin'**

Xalid Cebir di dawiya axaftina xwe de tekiz kir ku pêwîste mafê Kurdan di destûrê de were bicihkirin û wiha domand: "hikumeta demkî tenê wekî biryar çed xal ragihand û dibêje ev mafê kurdaye, lê ev wekî biryare ne di hundirê destûra Sûriyê de hatiya bi cih kirin, ji bo ku ev mersûn bi awyekî rast were bawer kirin, pêwîste di destûra Sûriyê were bi cih kirin. Her wiha gelê Kurd ewqas berxwedanî û qurbanî didin, ev jî ji bo mafê xwe yê rewa di hundirê destûra Sûriyê de mesoger bikin. ev yek jî pêwîste bi awayekî zagonî û hiquqî were dayin. Bi awayê ku ev biryarname hate derxistin, xuya dibe ku mafên gelên Sûriyê tê de wek tiştekî nû tên pêşkêşkirin. Lê rastiya vê yekê ew e ku maf tiştekî ku hatibe dayîn nînin, maf bi berxwedan û bi xweçêkirinê tên bidestxistin. Gelê Kurd û tevahî gelêpêkhateyên li Sûriyê, di nav krîza dirêj a welêt de, bi salan li ser bingehên xwe yên civakî û siyasî xwe ava kirine. Ew jiyana xwe li gorî mafên xwe yên xwezayî rêxistin kirine û ev jiyan ne encama biryarnameyê ye, lê encama têkoşîn û rêvebirina xwe ye.

Wekî ku hemû pêkhateyên civaka Sûriyê mafên xwe hene, mafên gelê Kurd jî divê di nav pêvajoya siyasî ya welêt de bi awayekî fermî û çalak werin naskirin. Divê Kurd bikarbin di nav Sûriyê de wek pêkhateyekî bingehîn û esîl cihê xwe bistînin, her wiha nasnameya wan ya siyasî, çandî û perwerdeyî bi rêz û bi qanûn were pejirandin. Ev yek şertê bingehîn e ji bo avakirina Sûriyekî yekbûyî û adil."

# ‘Hikumeta demkî dibin navê Islama siyasî de kiryarên dijmirovî pêktîne’

Rêveberê Mecilsa Olî ya bajarê Tirbespiyê Hogir Hesen eşkere kir ku hikumeta demkî ya Sûriyê li gorî berjewendiyên xwe islama siyasî bi kar tîne û got, “Hikumeta demkî ya Sûriyê dibin navê islama siyasî de kiryarên dijîmirovî pêktîne."

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Piştî ketina Rîjîma Bass hikumeta demkî ya Sûriyê bi hevkariya hêzên navnetwî hate li ser desthildariya Sûriyê, herwiha ji wê demê bi hişmendiya DAIŞ’ê kiryarên dijmirovî li dijî gelê Sûriyê nehatine rawestandin. Hikumeta Sûriyê navê xwe kiriye artêşa erebî ya Sûriyê, lê bingeha wê DAIŞ e, di heman demê de hêzên navnetwî piştgirtiya wan dike û çavên xwe jê re digirin. Ev hikumet demkî dibin navê islama siyasî û silogan jin û zarokan dikuje, sûcên dijî mirovahiyê pêk tîn e.
Di derbarê kiryarên dijmirovî yên hikumeta demkî ya Sûriyê dibin navê islama siyasî de rêveberê Mecilsa Olî ya bajarê Tirbesbiyê Hogir Hesen ji Rojnmeya me re axivî.

**‘Hikumeta Demkî dibin navê ol de mirovan qetil dike’**



Hogir Hesen anî ziman ku ji dema hatina hikumeta demkî ya Sûriyê ew bi hişmendiya DAIŞ’ê kiryarên hovana pêk tîne û wiha got: “Ji dema ku hikumeta Demkî ya Sûriyê hatiye ser desthildariyê kiryarên wê yên hovane li dijî gelê Sûriyê nehatine rawestandin. Lê belê hikumeta Demkî dibin navê ol û tayfetê de komkujiyanan pêk tîne û dibin navê islama siyasî û allahûekber de jin û zarokan qetil dikin. Lê ev kiryar û komkujiyên ku ji aliyê hikumeta demkî ve tên kirin, li dijî ola islamê ne. Hikumeta Demkî û giropên girêdayî wê ola islamê berovajî fêm dikin, lê belê islama demokratîk van kiryar û komkujiyên hovane yên ku hikumeta Demkî ya Sûriyê li dijî gel pêk tîne, şermezar dikin.”

**‘Dibin navê islamê de komkujiyan pêktîne’**

Hesen axaftina xwe wiha berdewam kir: “Hikumeta Demkî li gorî berjwendiyê xwe islama siyasî di meşînin, herwiha hikumeta Demkî ya Sûriyê, kuştina mirov, zarok û jinan rawedibîne, lê belê ev yek li dijî ola islamê ye. Di ola islamê de, nehatey gotin ku mirov, zarok û jinan serjêr û qetlibikin. Hikumeta Demkî dibin navê islama siyasî û allhûekber de, komkujiyan pêktîne, herwiha mirov, jin û zarokan serjêr û qetldikin. Me nedîtiye ku dibin navê ol û allahûekber de serê mirovan tên serjêrkirin, tu ol vê yekê nake. Di vê dema niha de, em dibîn ku dema kesek dibin navê islamê de tê qetlkirin çiqasî gelê me xemgîn dibe.”

**‘Islama demokratîk van kiryaran napejrîn e’**

Rêveberê Mecilsa Olî ya bajarê Tirbesbiyê Hogir Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ev kiryarên ku dibin navê islamê tên kirin, islama demokratîk û qurana pîroz bi tu awayê vê yekê napejrîn e, lê xeta islamê doza mirovên mezlûm û bindest dike. Ji aliyê hikumeta Demkî ya Sûriyê û giropên girêdayî wê gelek kiryar û sûcên dijîmirov li dijî gelên her du taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin kirin,herwiha temsîl bi laşê mirovan hatkirin û komkujî hatin kirin. Helbet dema ku êrişeke li ser welatekî wer kirin her kesê wê şer dike, çi jin be û çi mêr be, ji ber ku dibe pêxber de jî jin parastina mafê xwe dikir.”

## Sûriye û komploya piralî ya ku tê sazûmankirin



**Zekî Bedran**

Em demek dirêj e di derbarê amadekirina planeke aloz a di nava Sûriyê de dinivîsin. Di dema rejîma Baasê de jî hewldana vê yekê hebû. Herêmên ku piraniya hejmara niştecîhên wan Ereb bû her tim armanca vê planê bûn. Kurd û Ereb jixwe welatiyên Sûriyê bûn û li kêleka hev dijiyan. Ew ji hev biyanî nebûn. Wekî din, ew di şerê li dijî DAIŞ’ê de bûn yek, xwîna wan tevlihev bû. Wan xwe di avaniyên mîna QSD de birêxistin kirin. Pêkhateyan bi hevre rêveberiyên xwe yên xweser ava kirin. Bê guman, bi gelemperî Kurdan pêşengiya van hewldanan kirin. Ezmûna wan a berxwedan û rêxistinê kevintir û pêşkeftîtir bû. Têkoşîn û berxwedana Kurdan a li dijî DAIŞ’ê ya li Kobanê diyarker bû. Ev yek bi demê re bû sedema hilweşîn û têkçûna DAIŞ’ê ya li qadê.Reqa paytexta DAIŞ’ê bû. Herêmên Ereban yên mîna Minbiç, Tebqa û Dêrazorê bi piştgirîya Hevpeymana Navdewletî ve ji çeteyên DAIŞ’ê hatin paqijkirin. Bi gotineke din, Kurd û Ereb li van herêman dijbertiya hev nekirin. Di rastiyê de wan hevdu qebûl kirin û hembêz kirin. Niha îdiayên Tirkiyê yên ku bi armanca dezenformasyonê dibêje; “QSD herêmên Ereban dagir kiribû, piştî ku QSD ji van herêman hat derxistin, herêm ji terorê hate paqijkirin” ne rast in. Cîhan bi matmayî temaşe dike bê ka çawa rastî jî bi derewan tên kuştin. Wekî din, QSD her gav bi Hevpeymana Navdewletî re kar meşandiye. Ew neketiye şerekî din. Ji bilî dewleta Tirk, li cîhanê ti kesî QSD wekî rêxistinek terorîst bi nav nekiriye.Li Tirkiyê, pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan dimeşe heye. Ev salek e çek bêdeng in. PKK hebûna xwe û têkoşîna xwe ya çekdarî bi dawî kiriye. Ji bo nîqaş û çareseriyê zemînek hatiye avakirin. Tevî kêmasiyên xwe jî li parlamentoyê komîsyonek hatiye sazkirin. Lê belê hin derdorên bi bandor ên di nav dewletê de û rêveberiya ku di derbarê çareserkirina pirsgirêka Kurd de nezelal e, ji bo aştiyê di warê afirandina piştgiriya civakî de nexebitîn. Di dawiyê de, zagonên çareseriyê bi hinceta hilweşandin û bêçekkirina QSD ya li Sûriyê ve girêdan. Ji ber vê yekê, ev komplo pêvajoya aştiyê ya li Tirkiyê jî armanc dike.
Hikûmeta Tirkiyê bi awayekî yekalî peymana 10’ê Adarê wekî ku Kurd û Rêveberiya Xweser dest ji hemû daxwaz û mafên xwe berdin û her tiştî radestî dewletê bikin şîrove kir. Nehişt ku HTŞ bi QSD û Rêveberiya xweser re lihevkirin û çareseriyekê peyda bike. Hewldanên di vî warî de kêm û zêde tên zanîn. Di dawiyê de Sûriyê avêtin nava êrîş û aloziyên nû. HTŞ’ê hemû hêzên xwe yên çekdar ên li Sûriyê, li herêmên Rêveberîya Xweser bi cih kir. Dewleta Tirkiyê ev yek plan kir û koordîne kir, her wiha komên çekdar ên girêdayê xwe jî tevlî pêşengiya van êrîşan kir. Wekî din, bi rojane digot; “ger ku HTŞ însiyatîf bigre û êrîş bike, ez ji bo piştgiriyê amade me”.
Bê guman, ew ji bo temamkirina plana xwe ya tevlîheviyê û bi êrîşên leşkerî re sînordar neman. Hinek derdorên li herêmên Ereb ku demek dirêj li ser dixebitîn jî kirin nava liv û tevgerê. Gotin ku qaşo gel li dijî QSD’ê rabûye serhildanê û hwd. vê yekê têra xwe xerab bi kar anîn. Ew dizanibûn hêzek mîna QSD’ê ku li ser bingehekî demokratîk hatiye damezrandin û ji Ereb û Kurdan pêk tê, berê çeka xwe nade gel. Rast e ku hin derdor ji van provokasyonan bandor bûn û hinekan jî hevkarî kirin. Lê tevî gotinên nifret û dijminatiyê yên li dijî Kurdan jî Ereb neketin nava vî şerî. Ne rast e ku mirov bi vî rengî pênase bike û di navbera gelan de bêbawerî û reşbûnê çêbike. Divê mirov li derûniya girseyî jî baldar be. Dema ku alozî çêdibin û bi deh hezaran komên çekdar ji her aliyî ve bi tank û topan êrîşî QSD û herêmên Rêveberîya Xweser dikin, gelek mirov bandor dibin, dudil dibin û dikevin rewşa ‘ka em bişopînin wê çi bibe’. Jixwe beşek mezin a civaka Ereb di vê rewşê de ma.
Pêkhateya Ereb jî bi salan di bin sîwana Rêveberîya Xweser de jiyana xwe bi rê ve bir. Meclîsên wan hebûn. Zext li ser wan tune bû. Bawerî û jiyana xwe li gorî dilê xwe rêxistin dikirin. Piştî gelek salan, gihîştibûn navengeke rastîn a demokratîk û azad. Lê pêwîste sosyolojiya civakê jî were dîtin. Bawerî û nasnameya ku bi sedan sal hatiye avakirin, di demeke kurt de nayê derbaskirin. Wekî din, gel pir êş kişandiye û pêşeroja Sûriyê jî ne diyar e. Rêveberîya Xweser her tim hatiye armancgirtin. Avakirina aramiyê hatiye astengkirin. Êdî mirov gihîştine wê astê ku dibêjin, “Kê li ser rêveberiyê be bila bibe, tenê bila mirin û şer tune be.” Ji ber vê yekê jî pêwîste propagandaya ku dibêje gelê Ereb Rêveberiya Xweser naxwaze û li dijî Kurdan e, neyê guhdarkir in. Di êvara 18’hê Çileya 2026’an de, bi navê Ehmed Şera daxuyaniyek hat weşandin. Wan bixwe berê şertên xwe ji fermandariya QSD re şandibûn. Di van babetan de goftûgoh û danûstandin tune bûn. Tenê biryarên yekalî û ferman hebûn. Lê ev şert di demekê ku nîqaş li ser agirbest û rawestandina şer dihatin meşandin de hatin weşandin. Weke ku QSD wan mercan erê kiriye û lihevkirinek çêbûye hate nîşandan. Heta kêliya nivîsandina vê nivîsê jî ji aliyê fermandariya QSD’ê ve ti daxuyanî nehatiye dayîn. Hate ragihandin ku wê Mazlum Ebdî di dîroka 19’hê Çileyê de biçe Şamê.
Di daxuyaniya Ehmed Şara de ne demokrasî, ne xweserî û ne jî mafên nasnameya Kurdan hebû. Di daxuyaniyê de ziman û bêhna rejîmeke ku ji rejîma Baasê jî xerabtir bû hebû. Tirkiye, pêşeroja Sûriyê û hêviya demokrasî û azadiyê, dike qurbana siyaseta xwe ya ku dibêje; bila Kurd dayika xwe nebine. Aliyên ku QSD’ê û Rêveberiya Xweser qels kirin û vê komploye sazûman kirin, Sûriyê ber bi tarîtiyekî ve dehf didin ku ew ê bi salan êşa wê bikêşe.

## Mirovahiya bêwijdan



**Farûk Sakik**

Carna divê mirov nizane ji ku derê dest pê bike. Gelek nivisê me vala derketin. Texmîn û şîroveyên me rast derneketin. Ev yek jî ji me nebû. Me texmîn nedikir ewqas hovîtî û bêbextî derkevin pêş me. Me texmîn nedikir mirovahî evqas bêwijdan be.
Bêbextê mezin Amerîka bû. Bêşerm me li qada şer bi tenê hişt. Pir axivîn û pirr twîtter nivîsandin. Me jî li gor van axaftinên wan yê vala şîrove kir û em jî vala derketin.
Wan got bi navê QSD’ê di warê eskerî de birêxistin bibin. QSD sembola li dijî DAÎŞ’ê bû. QSD wek rêxistineke eskerî ya Kurdan nebû. Giraniya pêkhateyên wî ji Ereban pêk dihat. Ji Kobanê birêketibûn û li Bahozê dema ku DAÎŞ têk çû ev sazî hat avakirin.
Hêza Kurdan a pîroz YPG û YPJ ye. Li Kobanê wan li ber xwe da. QSD’ê tune bû.
Ji bo çi min xwest van hevoka binivîsim. Ne ji bo em li QSD’ê xwedî dernekevin nîne. QSD ji bo herkesî pîroz bû. Mazlûm Ebdî hên jî fermandarê vê artêşê ye. Ev bi serê xwe pîroz û girîngiya vê rêxistina eskerî îzah dike.
Ez dixwazim behsa bêbextiya Amerîka bikim. Berdevkê wan li Şamê bû. Agirbestek re şahidî dikir. Lê di wan kêliyan de Kurd dihatin qetilkirin. Bêdeng bûn. Li sernavê QSD’ê biryar dabûn û bêtevger hiştin. Digotin lihevkirinek heye. Lihevkirina wan li Kobanê îroj qetlîam e.
Rêber Apo di destpêkê de behsa Amerîka û Îsraîl kiribû. Lê ji aliyê hin kes û derdoran ve nefahmkirinek ji van gotinê Rêber Apo hebû. Amerîka û Îsraîl wek hêviyek didîtin. Ocalan çi got? Got ev her du dewlet bilî berjewendiyên xwe tu tiştek naparêzin. Ji bo berjewendiyên xwe bi te re dimeşin, lê dema di vê meşê de rêwiyek din derkeve pêş wan, te li wê derê difiroşin. Aha va li Sûrî ev yek hat îspatkirin. QSD firot û çeteyên Tirk-Colanî tercîh kir.
Em vegerin kodên xwe. Em vegerin sala 2012’an, sala şoreşa Rojava. Ne Amerîka û ne jî Îsraîl hebû. Me bi hêza xwe bi xwe bawerî anî û me şoreşek pêk anî. Îro divê em wan sînorên xwe biparêzin. Parastin bi daketina kolana nîne. Kolanan êdî wateya xwe windakiriye. Kengê wenda kir ? Roja dewletên cîhanê parastina mafên mirovan dan aliyek û berjewendî-ewlekariya xwe derxistin pêş kolan bê wate bûn. Kolan wê demê, li ser ûcdana mirovahiyê bandor dikir. Lê ev ûcdan tune. Dive êdî ûcdana wan were êşandin.
Em dîsa vegerin hovîtiya li ser Kurdan. Ji 6’ê mehê hetanî roja me gav bi gav axa me dagirdikin. Gelek herem bidestxistin, anjî me ji gelek deveran destberda. Dêrazor Reqqa heremên ku me ji DAÎŞ’ê paqijkirin bû. Dema ji Kobanê em bi rêketin û li Bahozê dawî li DAÎŞ anî, gelên heremê tevlî vê berxwedanê bûn. Kurdan dixwestin ku li vêderê sîstemek rêveberiya xweser hebe. Amerîka jî ji bo parastina vê sîstemê QSD avakiribû. Îroj ku êrişan dest pê kir, gelên heremê HTŞ tercîh kirin û herem ket destê hêzên Şamê(çeteyên Tirkiyê). Me li wê derê tu tiştek winda nekir. Em vegeriyan ku sînorê şoreşa Rojava biparêzin. Îroj ev der jî dibin tehdîtek mezideye. DAÎŞ-Çete li du tola xwe ne. Êriş dikin. Ez ê bibêjim em vegerên rihê berxwedana Kobanê, lê ew rih nemaye.
Çima nemaye? Ew rih heye lê bandora wê tune. Meş û mitîng êdî bê wate ne. Berê dema meş dihatin lidarxistin, xîtabî û cdana mirovahiyê dikir. Bi mirovahiyê re êdî ew wijdan nemaye. Dive ku çalakiyên wijdana wan dêşîne werin lidarxistin da ku ew jî bikevin nav liv û tevgerê.



# Ji çiraxên hunera kurdî



**Can Yûsiv**

Hunerbend Ferhad Bekhinadî
“Çavkaniyek ji awazan qet zuha nabe, û buharek ji helbestan qet na çilmise.”
Hunermend, stranbêj, û helbestvanên kurd ên hemdem roleke wan ya berbiçav hebû mîna çiyayên bilind, ji ber ku wan mîrateya xwe ya çandî ji bayê jibîrkirinê û nasnameya neteweyî ji belavbûn û wendakirinê parastin.
Wan ji awazên xwe pir avakirin, ji dengên xwe minber çêkirin , ji stranên xwe ale afirandin ku
li asîmanê kurdayetiyê resen pêl didin , û nivîs û helbestên xwe kirin çiraxên ronahiyê di şevên tarî de , ji lewra wijdana gel bi wan ve hat girêdan, û doza wî bi nebeza têlên wan re ,bi vedenga gewriyên wan re , bi rastiya hest û peyvên wan re hatin tevlihev kirin.
Hunermend û helbestvanê kurd Ferhad Bekhinadî yek ji van hunermendên hemdem tê hesibandin, yên ku bi stran, muzîk û dengên xwe pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemendkirin û bi xîmava peyv û tîpên xwe asîmanê wêjeya kurdî ronî kirin, û ji bo nasnameya kurdî bûn nebezeke zindî û alayeke mayînde.

Di dilê Kobanê de, bajarê ku ser naçimîne li ber ti bahozan, ji despêka dîrokê heya îro , ku qiraxê Feratê himbêz dike , û bi awazên şalûl û bilbilan re, bi pestînên pirpirîkên li ser rûçikên gul û çîçekan re, bi sirûdên jinan di zeviyan de , bi stranên çotkaran di berbanga sibehê de şiyar dibe, hunermend, awazdêner û helbestvanê kurd Ferhad Bekhinadî di roja 4.4.1974’an de ,ji dayîk û bavek kurd (Hino û Zeyîde) li gundê ‘Bûbanê’, ku dikeve li bakurê rojavayê Kobanê , hate dinyayê û di himbêza malbateke kurd a neteweyî û kedkar de mezin bû, ku ji neh bira û pênc xwişkan pêk tê.
Ew di navbera sira bayê bajar û pestîna Firatê de mezin bû, ku dê û bavê wî di dilê wî de regezên(pransîbên) kurdayetiyê ên resen çandibûn, mîna dilsoziya ji bo welat, hezkirina azadiyê û şanaziya rûmetê.
Giyanê wî bi sirwedarên Kobanê ve girêdayî bû, û têlên wî yên muzîkî bênxweşiya xakê û hesretbûna wê dikişînin, her awazek ji dengê wî bû vedengek a jiyana gel
û her peyvek ji helbestên wî bû çîrokek a ji xaka ser naçimîn li ber ba û bahozan û alayek di livlive ji bo nasname û rûmetê.
Wî zaroktiya xwe di kolanên têng ên gundê xwe ‘Bûbanê’ de , di navbera zevî , deşt û çîmenan de,û li bin sîberên darên fisteq û Zeytûnan de, derbas kir , di bin sîya wan de wekî pirpirîkekî ku ji gulekî diçû ser çiçekekê, dilehîst, wî ji hawîrdora xwe û ji malbata xwe, ku bi stranên kelepûr û çanda kurdî tije bûn, huner û wêjeya xwe girt, û ji dengên xwezayê îlham û afrîneriya xwe wergirt,
Li wir, ku xuşîna ava Firatê diherike wekî awazek herdemî, û çîvçîva tiloran simfoniya sibehê diafirîne , sinbil digirin sema bi pêlên bayê re, di hundirê wî de hunerekî nazik afirandin, ku hişmendiya wî ya yekemîn vehûnandin û tovê afirîneriya wî ya edebî, hunerî û çandî derxistin holê.
Wî helbestên xwe yên yekemîn ji sirûdên çotkaran û stranên palevanan çêkir, û awazên xwe yên pêşîn ji lîlanên jinan di dewatan de û ji lavijên zikirê di mizgeftan de nivîsand, û xeyalên xwe ji qehremanî û berxwedana bav û kalên xwe li dijî dagîrkeran xêzkir.
‘Bûbanê’ dibistana wî yekem bû, û ezmanek ku di xeyalê wî de rengên xwezayê û henaseyên wê girêdide, lê malbata wî jî dibistana duyemîn bû, ji wê fêr bû bingehen huner û stranbêjiyê, ji çavkanîyên wê yên xweşav , ku ruhê wî xurt kir û hinêra wî pêşxist, heta ku dengê wî bû berdewamîya dengê xakê, û peyvên wî bûn vedenga nalîn û xewnên wê.
Henaseyên wî yên hunerî û hezkirina ji bo muzîk û stranbêjiya kurdî ji zarokiya wî dest pê kirin, dema ku hîn şeş sal derbas ne kir bû, di bin bandora dibistana hunerî ya malbata xwe, ku ji bav û bapîran wergirt bû, li ber destê bav û bapîrê xwe mezin bû, ji wan fêr bû nehînîyên muzîkî û hunerên stranbêjiyê, heta ku dengê wî bû berdewamîya vedenga mîrateya ku wî himbêz kir bû.
Ew di nav himbêza jîngeha dewlemend bi mîrateya çandî û hunerî de hat diyayê ,
ji çavkanîyên wê yên xweşav, awazê stranê û dengê helbestê bi şîrê dayika xwe re vedixwar , gavên xwe yên yekemîn di kolanên têng ên gundê xwe de despêkir , di qonaxa dibistana seretayî de ,bi apên xwe re di şevbuhêrkên di gundên derdorên xwe tembûr lêdixist .
Piştî wê, ew çû Kobanê da ku xwendina xwe ya navîn û amadehî bidomîne , li wir bajarê Kobanê ji bo wî deriyên nû vekir, û ew fêrî şêweyên hunerî yên cûda-cûda bû ,û ji çavkanîyên hunermend û helbestvanên navdar yên wek: (Mişoyê Bekebûrê, Baqî Xido, Mamed Kaşo, Bozan Ehmed û Hafizê Kor) zanistên huner , helbest û stranbêjiyî yê vexwart, ligel bandora çanda Ermenî ya ku li tecrûbeya wî kûrahî û dewlemendîyek zêde kir.
Her wiha wî ji ezmûna muzîkjenên mezin ên mîna: Hemedê Dûman, Memed Gulî, Hemkê Hadî, û hunermendên hevdem ên wekî : Reşîd Sofî, Miço, Baran Kindeş, tecrûbe û ezmûn wergirt, ev jîngeh dibistanek bû ku hunera wî pêşxist û îlham da wî ,da ku dîtina xwe ya hunerî ya taybetî biafirîne , li wir, di sala 1990’an de ew tevlî koma Botan bû , hunera xwe pêşxist û bi wan re beşdarî vejîna gelek pîrozbahiyên neteweyî bû û pir stranên tevhevî “komalî” jî tomarkir.
Di sala 1992’an de, bi komek hunermendên Rojavayê Kurdistanê re çû Herêma Kurdistanê, bi xwe re awazên Kobanê û gulava folklora kurdî hildigirt bû, da ku di gelek bajarên wekî :Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr û Dihok de pêşandanên hunerî û stranbêjî yê pêşkêş bike, li wir, dengên wî di meydanan û festîvalan de dengveda, û di navbera sala 1992 û 1994’an de beşdarî bi dehan çalakiyên hunerî û çandî bû.
Her weha ew di gelek komên hunerî û navendên çandî li Herêma Kurdistanê û Iraqê de beşdarî kir, wek:
- Navenda Çanda Mezopotamya – Silêmanî û Hewlêr.
- Navenda Çand û Hunera Rojhelat –li Kerkûk, Mosul, Baxdad û Mexmur.
- Dibistana Şehîd Sefqan.
- Dibistana Şehîd Sîpan li Qendîlê û bi wan re di tomarkirina deh stranên komî de beşdarî kir û di wê demê de, li bajarê Silêmanîyê, li bin rêveberiya komek ji mamosteyên muzîkê, wek Mamoste Bextiyar û Telhet û yên din, wî dersên xwe yên yekemîn di xwendina note û bingeha zanîna muzîkî wergirt ,ew qonax wek bingehek hêzdar bû ku zanistên

pêşxistin û bingehên rêya hunerî ya wî xurt kirin.
Di sala 1995’an de, festîvala Helepçe li Silêmanî bi dengê wî ronî bû, û wî xelata yekemîn wekî hunermendê tekane yê herî baş wergirt, tekez kir ku taybetî û dengê wî, bû nîşaneke hunerî ku vedenga wê di nav bajar û gundan de dengveda û awazek ku bi derbasbûna rojan qet na vemire.
Di dema rêwîtîya xwe ya hunerî de, wî zêdetir ji sed stranan çêkir, beşek ji wan tomarkirî ye û beşek din hîn ronahî ne dîtîye , herwiha wî çar albûmên stranbêjiyê weşandin, her yek ji wan deh stran tê de hene:
1- Albûma yekem bi navê «Dilo» – 1999
2- Albûma duyem bi navê «Evîna Sedsalê » – 2004
3- Albûma sêyem bi navê «Gula Biçînin » – 2011
4- Albûma çarem bi navê «Xewjîna Min » – 2019.
Herweha jî albûmek nû li benda amadekirin û weşandinê ye.
Piştî destpêkirina Şoreşa Rojava di 19 Tîrmehê û azadkirina bajarê Kobanê, Ferhad gelek stranên şoreşgerî pêşkêş kir ku ruhê têkoşîn û xebatê nîşanî didin, ji wan ên herî navdar :
1- YPG Hat
2- Kobanê Tu Dayika Me.
Ji çavkaniyên wî yên hunerî û edebî, gelek hunermend û komên hunerî yên kurd ji wan vexwartin ,ji nav hunermendên herî navdar ku stranên wî yên ji awaz û peyvên wî gotine:
1- Delîl Mîrsaz ( Ez pirgeryam)
2- Rêzan Şêrwan (Ava Şîn)
3- Hesan Dêrîkî ( Efrîn)
4- Wail Çaço (Girkê Legê û Şiblî)
5- Sa’dûn Kobanî (Dûrekî Dûr)
6- Hisên Xanî ( Min Bîrya te kire)
7- Hikmet Hacî ( Tu nazikî)
8- Sosen (Heval)
9- Aştî Şakir (Demek bûrî)
hunermend Ferhad Bekhinadî di têcrubeya hevduet û beşdariya bi kom û gropan re di pêşkêşkirina stranên tevahî de bi gelek hunermendên kurd û komên hunerî yên kurdî cî girtiye , di nav wan de:
- Bi koma Berxwedan re, ew beşdar bû bi: (Hozan Serhed – Kawa – Şemdîn – Çiya – Sefqan – Rutinda – û Sosin re ),
- Bi komek hunermendên din re jî wî stran gotine wek: (Delîl Mîrsaz – Talib Resûl – Kawa Ûrmî – Arî Can – Fazil Çep – Abdullah ji koma Botan … hwd.)
Hunermend Ferhad bi dehan klîpên vîdyoyê pêşkêş kir, pê pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemendkir ji awaz û gotinên xwe , da ku dengê wî bibe çîrokek muzîkî di navbera dil û guhan de biherike , ji nav wan:
1- Tu Şêrînî Ey Welat
2- Çarçêla
3- Dema Em Şervan Bûn
4- Tu Bi kûve Diçî Yar
5- Newroz
6- Xewn û Xewjîna Min
7- Efrîn Dara Zeytûnê
Her stranek deriyek bû bo cîhana wî ya hunerî, vedengek zindî ya afirandin û folklorê bû ku ruhê mûzîka kurdî bi rengekî bedew vediguhust.
Hinêra wî li sînorên stranbêjiyê, awazdanîn û lêxstina sazê ne rawestiya , lê derbas kir û bû çemek din ku diherikî ji helbestan , wî bi hemû rengan helbest nivîsî ,ji helbesta klasîk ya bi rêzbend û kêşe heya bigihîje helbesta nûjen , azad û pexşan ,wekî ku ew lêgerîna zimanekî dike ku hevsengiya dengê wî bike û henase ya wî bi peyv û stranê re wergerîne.
Wî du dîwanên helbestan weşandin ku bûn vedengek kûr ji deng û stranên wî re:
1- Ava Şîn
2- Kendava Dil
Û herwiha dîwana wî ya sêyemîn jî li ber çapê ye.
Piraniya helbestên wî ji şêwaza helbesta nûjen û azad in, mîna robarekî zelal diherikin, giyanan şadikin , birînan sax dikin û nîşaneke mayînde di hestan de dihêlên.
Hunermend Ferhad Bekhenadî di sala 2004’an de bi xanim Necma Mihemed ya ji gundê Til Cemal li devera Dêrîkê re zewicî, wan çar kur hene:(Zorvan, Huner, Sîper, û Yanî), bi demê re ew bûn berdewamîya malbata wî ya hunerî û çandî, bi wî re mîrasa wî ya afrîneriyê hildigirin , û ji ezmûn û awazên wî yên şêrîn hêz girin.
Hunermend Ferhad nêzîkî sêzdeh sal li bajarê Silêmaniyê jiyana xwe derbas kir, di vê demê de di navbera çiyayên û geliyan de germiya, gelek stran nivîsand û afirand, herwiha bi komên hunerî yên li wir re ,du albûmên dewlemend weşand, ku nîşaneke taybet li pirtûkxaneya hunerî ya kurdî hiştin.
Piştre, di sala 2004’an de ew vegeriya Rojavayê Kurdistanê, lê ji ber şertên siyasî û çalakiyên wê yên hunerî û çandî ew bû armanca peygerîn û şopandinê, ew ji hêla rayedarên ewlekariya Sûrî ve hate girtin, û binçavkirin û du sal û nîva li Zindana Edrayê li Şamê maye, lê nekarîn pêta afrîneriya wî vemirînin û îradeya wî bişkînin ,piştî derketina wî ji zindanê , wî rêwîtiya xwe ya hunerî bi her hêz û hezkirin berdewam kir, di heman demê de deng û awazên xwe wekî peyamek zindî ya çand û hunera kurdî parast.
Di navbera 2014 û 2017’an de, hunermend Ferhad berpirsiyarê beşê muzîkê ya li Girkê Legê û Rimêlan bû, wî bi hevalên xwe re Koralek ji 40 kesî afirandin û stranek mîna simfoniyek nêzî 20 xulekan berdewam kir û zindî di Ronahî tv de şeva Newrozê hat weşandin
Her weha wî serpirştiya koma jinan ya “Elenya” jî dikir û çend stran ji bo wan amadekir, ya herî navdar jî strana “Şîlan” bû.
Ew niha li
Peymangeha Amadekariya Mamosteyan li Qamişlo beşa mûzîkê mamostatiyê dike
bi vî awayî xebata wî ya akademîk û hunerî tê dewam kirin, di navbera taybetmendiya zanistî û tecrûbeya pratîk de hevrêziyê dike,
da ku hebûna xwe wekî hunermend û mamoste di heman demê de saz bike.

Hunermend Ferhad ne tenê hunermendek, an awazdênerek , an jî nivîskarek e; lê belê, ew dibistanek hunerî û edebî ya temam e, ku gelek hunermend û stranbêjan ji çavkaniyên wî vexwartine , û ji nêrîn û afirandina wî ya hunerî û çandî hîn bûne.
Sî û pênc salî ji têkoşîn û xebateka domdar di qadên wêjeyî, hunerî û çandî,
bê west û rawestandin , bi rêya wê hinêra xwe pêşxist û bi deng û awazên xwe mîrateyek nemir afirand.
Evro, ew di xurtbûna dayîn û afirîneriya xwe de ye, û gelek amûrên muzîkî dizane lêbêxe , wekî: tambûr, keyboard, gîtar û def,ew li sazê dêxe, dinivîse û distirîne bê rawestandin û bi xwe re peyamên huner, nasname û çandê hildigire, awazan digihîne gel ku diherikin giyan û şopek nemir di bîra guhdarvanan de dihêlên ,bi vî rengî ew nimûneyekî hunermendê kurdî nîşan da ,ku hevbexşiyê dike di navbera huner, ciddîyet û afirandinê de.
Hêviyên min ji bo wî serkeftin û afrînerîyek zêdetir di meşa wî ya wêjeyî û hunerî de

# Çandiniya zivistanê û rola wê di aboriya Sûriyê de

Çandiniyên zivistanê li Sûriyê stûneke aborî ya giring pêktînin, ji ber rola wan a rasterast di destxistina ewlehiya xwarinê û peydakirina derfetên kar. Nemaze di çarçoveya pirsgirêkên avhewayî û aborî ku welêt tê de derbas dibe.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Cewhera çandiniya zivistanê li gorî jîngehên erdnîgarî û avhewayî tê guhertin, lê giringiya wê ya aborî li welatên çandiniyê sabît dimîne. Li Sûriyê, berhemên zivistanê ji bo hilberînê demsalek stratejîk temsîl dikin, ku serkeftina wan bi plansaziyek baş, pabendbûna bi bernameyên çandiniyê û rêveberiya bi bandor a çavkaniyên sînorkirî ve girêdayî ye.

Zivistan demsala herî sar a salê ye, ji ber ku germahî dadikeve asta herî nizm, tevî şert û mercên dijwar û sar, gelek sebze û fêkî hene ku dikarin di zivistan û payîzê de werin çandin û di biharê de bigihîjin, her çend hin ji wan demek dirêjtir dibe, heta dawiya havînê. Ji ber vê yekê, zivistan ji bo dabînkirina mîqdarên mezin ên xwarinê ji bo mirovan girîng e. Çandiniya zivistanê bi zêdekirina karbona organîk û enerjiya ku bi rêya nebatan diherike nav axê, alîkariya baştirkirina axê û kalîteya wê ya kîmyewî, fîzîkî û biyolojîk dike, ji ber vê yekê zivistan ji bo çandiniyê pir girîng e.



### Rola çandiniyê di aboriya Sûriyê de

Çandiniya zivistanê yek ji giringtirîn sektorên berhemdar li Sûriyê ye, ji ber ku beşek mezin ji gelê wê wekî çavkaniyek sereke ya dahat û xwarinê dibîne. Di şert û mercên heyî de, ev çandinî du qat giringiya aborî bi dest xistiye, ji ber ku ew beşdarî zêdekirina xweseriya di kelûpelên xwarinê yên bingehîn de dibe, zexta li ser bazaran sivik dike û guherînên bihayê kêm dike.

Berhemên zivistanê xwedî taybetmendiyeke ku lêçûna hilberînê kêmtir e li gorî berhemên havînê, ev yek di encama germahiyên nerm û rêjeyên dûmanê yên kêmtir e, ku xerckirina av û enerjiyê kêm dike. Herwiha ev berhem di demekê de têne çandin ku li gorî avhewaya Sûriyê ye, nemaze li deverên çandiniyê yên sereke yên wekî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Deşta Xab, gundewarê Helebê û gundewarê Şamê.

Ji aliyê aborî ve, çandiniya zivistanê derfetên kar ên demsalî û daîmî peyda dike, çi di çandinî, çi berhevkirin, hem jî veguhestin û depokirinê de be, ku çalakiya aborî li gundan zêde dike û koçberiya ber bi bajaran kêm dike.

### Genim: Çandiniyeke stratejîk e

Genim giringtirîn berhema zivistanê li Sûriyê ye, ji ber ku ew xwarineke sereke ye ji bo nifûsê û rola wê ya giring di polîtîkayên çandinî û aborî yên welêt de ye. Çandina genim bi gelemperî di Mijdar û Kanûnê de dest pê dike, li gorî herêmê û mîqdara baranê.

Çandiniya genim ji hêla aborî ve giringiyeke wê ya mezin heye, ji ber ku berfirehkirina hilberîna navxweyî dibe alîkar ku fatoreya anîna wê kêm bibe herwiha pereyê biyanî were parastin û ewlehiya xwarinê ya neteweyî zêde bibe. Di heman demê de Genim ji bo hejmareke mezin ji cotkaran, nemaze li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, çavkaniyek sereke ya dahatê pêk tîne. Baştirkirina hilberîna genim yek ji giringtirîn pirsgirêkên aborî ye, ji ber ku ew bi dabînkirina kelûpelên hilberînê, baştirkirina tovan û pejirandina rêbazên çandiniyê yên nûjen ve girêdayî ye ku lêçûnan kêm dikin û vegerandin zêde dikin.

### Çandiniyên êmên sewalan û bandora wan li ser sewaldariyê

Çandiniyên êmên sewalan yên zivistanê, bi taybetî Persîm, roleke aborî ya nerasterast a giring li Sûriyê dilîzin. Ew çavkaniya sereke ya êmê sewaldariyê ye, ku ew bi xwe sektoreke temamker a aboriya çandiniyê ye. Çandiniya êmê sewalan dibe alîkar ku lêçûnên çandiniya ajalan kêm bibin, ku ev yek di bihayên goşt, berhemên şîr û berhemên wan ên li bazarên herêmî de jî nîşan dide. Herwiha ev çandinî berhemdariya axê baştir dikin û hewcedariya bi semada kîmyewî kêm dikin, ku ev yek ji bo cotkaran xerciyên aborî yên zêdetir, kêm dike.

### Nîsk: Nirxa xurekî û vegera aborî

Ji ber nirxa wan a xurekî ya bilind û lêçûnên hilberînê yên nisbeten kêm, nîsk li Sûriyê berhemên zivistanê yên giring in. Fasûlî di vê kategoriyê de wekî berhemeke bingehîn derdikeve pêş, di heman demê de beşek ji sîstema xwarinê ya rojane ji bo hejmareke mezin ya malabatan e.

Ji aliyê aborî ve, hilberîna nîskiyan dibe alîkar ku çavkaniyên dahata cotkaran pirreng bibin û xetereyên girêdayî xwesiparatina yek çandiniyê kêm dike. Lêbelê, hesasiyeta van çandiniyan li hember dîrokên çandiniyê, dihêle ku pabendbûna bi demên guncav re ji bo dûrketina ji windahiyên ji ber kêzik û nexweşiyan sektoreke giring be.

### Kartol

Kartol di nav berhemên zivistanê de li Sûriyê cihekî giring digire, ji ber ku ew berhemeke pereyî ye ku di demek kurt de vegera aborî ya baş çêdike. Kartol di mehên payîz û destpêka zivistanê de têne çandin û di navbera 100 û 120 rojan de digihêje pileya berhemê. Giringiya aborî ya kartolan di pirrengiya wan de ye, çi ji bo vexwarina rasterast an jî ji bo hilberandina xwarinê be, ji bilî rola wê di teşwîqkirina bazirganiyê de yên têkildarî hilanîn, veguhastin û bazarê, bi vî rengî nirxa çandiniyê xurt dikin.

### Sebzeyên pelî û aramiya bazarê

Çandiniyên zivistanê li Sûriyê cûrbecûr sebzeyên pelî yên wekî xes, cercîr, sebanix û lehane dihewîne. Ev çandinî kurtbûna dewreya xwe ya hilberînê xwedî taybetmendiye, ku vegera aborî ya bilez peyda dike. Sebzeyên pelî di demsala zivistanê de beşdarî aramiya bazarên herêmî dibin di heman demê de dibin alîkar ku kêmasiyên xwarinê werin çareser kirin û berhemên teze bi bihayên maqûl peyda bikin, ku bandorek erênî li ser xerîdaran dike.

Sebanix çandiniyeke ku dikare li hember germahiyên nizm li ber xwe bide, lê lehane hewceyê avhewayek nerm û sar e, ji ber vê yekê ew ji bo avhewaya Sûriyê di zivistanê de guncav e.

### Sîr

Sîr yek ji giringtirîn berhemên zivistanê li Sûriyê ye, bi gelemperî di payîzê de tê çandin da ku sûdê ji sermaya zivistanê werbigire. Ew li gelek deverên çandiniyê, bi taybetî li erdên berhemdar ên bi hewakirina baş a axê, belav e.

Ji aliyê aborî ve, ji ber pirrengiya wê di xwarin û dermanan de, sîr li gorî gelek berhemên din ên zivistanê xwedî nirxek bilind a bazarê ye. Di heman demê de ew berhemeke ku dikare ji bo demên dirêj bêyî windabûna girîng a kalîteyê were hilanîn, ev yek di dema firotanê de nermbûnê dide cotkaran û dibe alîkar ku windahiyên ji guherînên bihayên demsalî kêm bikin.

Sîr di pîşesaziya xwarinê de wekî madeyek sereke jî tê bikar anîn herwiha dikeve çêkirina derman û pîşesaziyên kevneşopî de jî, ku derfetên ji bo hilberîna herêmî vedike dê dikare nirxa zêdekirî ya çandiniyê zêde bike. Wekî din, sîr bi şiyana xwe ya li hember germahiyên nisbî ya nizm xwedî taybetmendiyeke, ku ew ji bo çandiniya zivistanê li piraniya herêmên Sûriyê guncan dike.

### Pîvazên kesk



Pîvazên kesk çandiniyeke zivistanê ya zû mezin û dubare dibe, di payîz û destpêka zivistanê de tê çandin, dikare di demek kurt de gav bi gav were berhevkirin. Giringiya wan di şiyana wan a çêkirina dahatiyek bilez de ye, nemaze ji bo cotkarên ku xwe dispêrin herikîna drav a domdar. Ji hêla aborî ve, pîvazên kesk di seranserê zivistanê de ji ber karanîna wan a berfireh di xwarina rojane de daxwazek mezin li bazarên herêmî heye. Wekî din, çandina wan li gorî çandiniyên din lêçûnên zêde hewce nake, ku wan dike vebijarkek guncav ji ber lêçûnên zêde yên têketinên hilberînê.

Pîvazê kesk ji aliyê bazarkirinê ve berhemeke nerm e, ji ber ku ew dikarin piştî çinînê yekser teze werin firotin, bêyî ku hewcedariya wan bi depoyeke dirêj an operasyonên pêvajoyê yên tevlihev hebe, ku ev yek windahiyên çandiniyê kêm dike û qezenca tam ji bo cotkaran zêde dike.

### Şewender Sikerî

Şewender Sikerî li Sûriyê çandiniyeke zivistanê ya di piraliyan de tê bikar anîn, ji bo hilberîna şekir tê bikaranîn. Şîyana wê ya geşbûna di avhewayên sar de dihêle ku ew ji bo çandina zivistanê li gelek herêman guncav be.

Çandiniyên zivistanê li Sûriyê stûneke aborî ya giring pêk tînin, çi ji aliyê ewlehiya xwarinê ve, çi ji aliyê piştgiriya dahata gundan ve, çi jî ji aliyê aramkirina bazaran ve. Di çarçoveya pirsgirêkên aborî û avhewayê, pêwistiya xurtkirina vê sektorê bi rêya plansaziya çandiniyê ya baş, piştgiriya cotkaran û baştirkirina hilberînê heye, da ku domdariya çandiniya zivistanê wekî yek ji bingehên aboriya Sûriyê were misogerkirin.



# ‘Divê Kurd bi hemû nêrîn û stratejiyên xwe bibin yek’

Siyasetmedarê Kurd û endamê KNK'ê Kamîran Berwarî da zanîn ku ew bi hemû hêza xwe piştevaniya sîstema Konfedralîzma Demokratîk û Rêveberiya Xweser dikin û got, “Kompleyek bi destê Erebistana Siudî, Îmarat, Qatar û dewletên Rojavayî li ser xak û projeya Rojavayê Kurdistanê heye.”

**Esma Miştefa**

Sûriyê serdekem nû ji perçebûn û belavbûyînê jiyan dike, qirkirina gelê Kurd di Helebê de rûyê desthillata hikumeta demkî ya Sûriyê diyar kir. Di derbarê êrişên li ser Rêveberiya Xweser û bi taybet li li dijî gelê Kurd, siyasetmedarê Kurd û endamê KNK'ê Dr. Kamîran Berwarî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn rewşa sûriyê bi giştî piştî derbasbûna salekê di ser hatina Colanî re û çawa dinirxînin û rewş ber bi ku ve diçe?**

Belê; Ger em bala xwe bidinê rewşa Sûriyê bi derbasbûna salekê re ji berê xirabtir bûye. Li şûna dîktatorekî komeke dîktator hatine, li şûna leşkerekî qirker, komek û bi hezaran gropên qirker û nijadperest hatine. Di vê salê de Sûriye nikarî tiştek bikira ji ber her ku paş ve çûye, gelek perçeyê ji axa xwe ji dest daye, nikare hilbijartinan bike, nikarî destûreke hevpar ji bo gelê Sûriyê danî ba, nikarîbû serokekî ji bû xwe hilbijêre. Her wiha nikarîbû rewşa ewlekariyê, aborî, siyasî û civakî baş kiriba û jiyaneke bi ewle ji gelê xwe re avakiriba.

Ji ber wê ev hikumet di qeyraneke stratejîk de jiyan dike, çarenivîsa pêşeroja wê jî ne diyar e. Ji ber ku ev hikumet bi xwe nehatiye, hinekan ew aniye û erkdar kiriye, lewma nikare tiştekî ji vê zêdetir bike.

Piştî Ehmed el Şeri ango Colanî ku navê wî dema di girtîgehên di Îraqê de Emced Mazhar Huseyîn Elî el Neêm bû, piştî wê navê xwe kiriye Ehmed Husên Elî el Şari her wiha bi navê Osama el Ebesî el wahêd hatiye naskirin, ev ne zilamê dewlet birêvebirinê ye ango zilamê siyaset û demokratiyetê ye. Ev kes hebûna wî ji bo hêzên Rojavayî girîng e. Ji ber ew dibînin ku ev kesayeta ku hatiye avakirin di wêrankirin û talankirina Sûriyê de yê herî guncaw e.

**Hêzên cîhanî ku dixwazin rewabûnê bidin hikumeta Colanî, bi taybet DYA, Fransa, Almaniya û Birîtaniya armanca wan a sereke çi ye?**



Dewletên Rojavayî ku ne tenê ev ên we anîne ser ziman, gelek dewletên global yên din jî cihê xwe tê de digrtin, ev dewlet sazûmankarê rêxistinên Îslamî yên weke, DAIŞ û rêxistinên Cîhadîst yên weke Qaîde in. Colanî heya niha jî di bin kirasê medeniyetê de ji bo û bi hişmendiya DAIŞ'ê kar dike. Ji ber wê jî her armanca wan ew e ku Rojhilata Navîn weke tişta ku li Sûriyê kirine li wê jî bikin.

Heger gelê Sûriyê li hember van qeyranan û zilma ku bi navê Îslamê dikin bêdeng bûn û ew bi ser ketin, dê hewil bidin li Îraq, Îran, Tirkiye, dewletên Erebî yên weke Urdin, Îmarat û heya Bakurê Efrîqiya jî wê heman siyaseta Îslama sexte bikar bînin. Ev yek jî li dijî Îslamê ye da ku ruhê Îslama rast ji holê rakin. Em dizanin ku Îslama rast exlaqî û wîjdanî ye li ser girêdana gelan, netewan û olan hatiye avakirin ku tu kesî înkar nakin.

**Niha li dijî gelê Kurd li Sûriyê êriş û pilanên qirkirinê tên meşandin, ji xwe êrişên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê her tiştî zelal dike, li hemberî van êriş û planan çi ji tevahî gelê Kurd tê xwestin?**

Em baş dizanin ku armanca sereke ji avakirina sîstemeke dîktator li Sûriyê, ne ku demikrasî û aştiyeke mayînde li Sûriyê bê avakirine. Armanca wan ew e ku gelê Sûriye her çiqas berbelav bibe, koçber bibe û di nava ne ewlehiyê de jiyan bike ye û desthilatdariyeke şofînîst ya dîktator bê avakirin.

Her wiha tesfiyeke etnîkî û olî li wir bê kirin. Eger rewş bi vî rengî berdewam bike û dewletên Rojavayî pişrtigirya van kom û desthilatdariyê bikin. Wê di Sûriyê de ne Xiristiyaniyek, ne durzî û Elewiyek û ne Kurdek wê di Sûriyê de jiyan bike. Nimuneya vê jî me dît ku di sala derbasbûyî de çi bi serê Xiristiyanî, Elewî û Durziyan hate kirin. Bi taybet qetlîamên ku li ser gelê Kurd di Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de kirin û êrişên xwe yên li ser Bendava Tişrînê.

Helbet li hember van êriş û pilanan ji gelê Kurd tê xwestin ku bi yek reng, deng û stratejiyê li Rojavayê Kurdistanê tameşe bikin. Ji ber ji aliyekî ve êrişên ne rewa li ser kesayet û fermandar Mazlûm Ebdî, Îlham Ehmed û kesayetên pêşeng tên kirin. Her wiha Rojavayê Kurdistanê armanc tê kirtin ku di vê kompoyê de piranî dewletên Erebî bi taybet Siudiyê, Îmarat û Qeter tê de beşdarin. Her wiha Tirkyê û hinek dewletên Ewropî, herêmî û Rojavayî jî tê de beşdarin. Ew bi giştî Kurdekî nezan, bêdeng, mirî, xayên û kirêgirtî dixwazin. Ew Kurdekî zane, welatperwer û xwedî îrade naxwazin.

Bilat u kes dudilî nebe, gelê Kurd bi giştî her çar perçeyên Kurdistanê li kêlek gelê Efrîn, Serê Kariyê û Girê spî ne û li gel Kurdên me yên Helebê ne. Ji ber Kurdên me yên li Helebê dimînin Kurdên resen in beriya zayînê bi 12 hezar sal li wir hebûn. Li welatên Şam di binyad de beriya her kesî Kurd hebûn û her Kurd li wir hakim bûne. Ev gel û netewên di li gel Kurdan jiyan kirine û têkilî kirine. Ji ber vê nabê Kurd ji Helebê û ji cihekî din derkevin divê li wir bimînin û xwe biparêz in. Her wiha xaka Rojava yak u bi xwîna şerfanên me hatiye avdan divê her parastî bimîne.

**Wekî KNK li hemberî êrişên li ser Rojava xebatên we çi ne?**

Li hember van êrişan em weke KNK helwestên niştîmanî û neteweyî hebûn, daxuyanî hatin dayîn û piraniya endamên KNK'ê li ser asta siyasî, dîplomasî, herêmî û navxweyî û cîhanê xebat kirin. KNK'ê bi temamî di xizmeta doz û gelê Kurdistanê de ye. her wiha divê KNK'ê doza Kurdî bi awayekî demokratîk û aştîxwaz çareser bike. Kiyanekî Kurdî û Kurdisatnî yê serbixwe hebît, Kurdistaneke rizgar, miletekî azad, statuyeke demokrasî bi her çar perçeyên Kurdistanê divê hebe.

Derveyî vê qet çareseriyeke din nîn e. Em weke KNK'e jî bi hemû hêz û îradeya di KNK'ê de piştevaniya sîstema Konfedralîzma Demokratîk û Xweseriya Demokratîk a ku li Rojavayê Kurdistanê hatiye avakirin ku mînaka herî ciwan û xweş li cîhanê ye, dikin.

**Banga we ji bo gel û partiyên Kurdan li ser asta Kurdistan û cîhanê çi ye?**

Bangawaziya me ji bo hemû Kurdan, partî û hêzên Kurdistanê li hundir û derve ew e ku bila rastiyekê bizanibin ew jî Kurdistan dagirkirî ye, û ev qet nebe ji dused salî ve gelê Kurd ji bo doza xwe têkoşînê dikin. Miletê Kurd bi çi awayî dest ji azadî û doza xwe bernedaye. Armanca Kurdan diyar e, tewecuha di vê demê de kî dike diyar e, ew jî Qendî û Îmraliye ku ev rastiyeke. Nimûneya wê jî Şingal, Mexmûr û Rojavayê Kurdistanê ye. Ji ber vê divê Kurd hemû dîtin û stratejiya xwe bikin yek. Ji ber me dît ku bi rengekî sîstemekirî dijiyatiya bizava rizgarîxwaziya Kurdî tê kirin.

Lê em dibêjin ku di vê serdemê de qet tu kes nikare doza Kurdî ji nav bibe ango gelê Kurd qir bike, ji ber gelê Kurd di nav xwe de xwedan hêz û leşker e. gelê Kurd xwedî zanebûn û têgihiştina serdemê ye, wê tu carî ji vir û şûn ve bê azadî wê jiyan neke. Pêwîst e jî li her cihekî ku gelek girêng e ev xal ji bo Fermandarên QSD'ê ku her cihekî guleyek li hember gelê Kurd tê avêtin, divê hezar gule here wê derê. Ji ber ku hêz li beramber hêzê tê bikaranîn, dîplomasî li hember dîplomasiyê û mirovperwerî li hember mirovperweriyê tê kirin. Lê nabe ger mirovperwer be li hember wî tang û top bên bikaranîn. ji ber wê yekê jî ez bawerim dizanin ku wê çawa Rojava û gelê Kurd çawa biparêz in. Divê ji cihekî neyê vekişandin ku diviyabû ji her du taxên Helebê jî venekşiyabana. Divê hevpeymanekê li gel welatên navnetewî bikin da ku xaka xwe biparêzin û wan komên biyanî werin derketin.

Ya dawiyê ez dixwazim bêjim, gel Kurd li çar perçeyên Kuridstanê di qonaxa qirkirinê de ne, divê hêzên Kurdî li gek YN, rêxistin û hêzên navnetewî siyaset û stratejiya xwe biguherînin û daxwaza Kurdistana meznin bikin. Li ser bingeha cografiya kevin ya Kurdistanê ku van dewletan xwe li ser axa me xwe bicihkirine. Ev mafekî me yê fermî ye.

## Koalisyona li dijî DAIŞ’ê hatî avakirin îro li aliyê DAIŞ’ê ye

Erdogan Altan

Peymana 10’ê Adarê wekî derfeteke dîrokî ji bo wekhevî û aştiyê di navbera gelan de dihat dîtin. Lêbelê, hesabên qirêj ên hêzên herêmî û navneteweyî ev derfet veguherandin lîstikeke aştiyê ya derewîn. Îro, koalisyona dijî DAIŞ’ê ya bi serkêşiya Amerîkayê hatibû damezrandin îro li alîyê DAIŞ’ê ye.

Peymana ku di 10’ê Adara 2025’an de hat îmzekirin, bendên girîng ên wekî agirbest, naskirina mafên destûrî yên gel, vegera koçberan û entegrasyona saziyan dihewîne. Lêbelê, pêvajo ji ber destwerdana dewleta Tirk hate têkbirin. Êrîşên li ser taxên Kurdan ên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê hem vê peymanî û hem jî Peymana 1’ê Nîsanê têk bir. Jixwe di encama van êrîşan de ku ji xwe re wek e serkeftinekê dîtin, biryarnameyekê ku Colanî 6 roj ji holê winda bibû û di encamê de li Enqere hatibû dîtin û nivisandin hate xwendin. Bi vê biryarnameyê awayek xwezayî peymana 10’ê adarê ji holê rakir. Lewra madeyên di biryarnameyê de hatin nîşandan jixwe ev 14 salin Kurdan bi têkoşîn û bi xwîna hezaran şehîdan bidest xistibû. Ango ev biryarname hêj di dema rejîma Esad de jî bi zorê be jî hatibûn qebulkirin, heta em dikarin bêjin ev biryarname pir li paş a dema rejîma Esad de maye, wek e belgeyeke şermê kete dîrokê.

Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê, li şûna ku îradeya gel nas bike, bêçekkirina QSD’ê ferz kir. Ev binpêkirinek rasterast a ruhê peymanê bû. Li başûr li dijî Durzî û li peravê li dijî Elewiyan komkujî pêk hatin. Ferzkirinên dewleta Tirkiyeyê û nakokiyên berjewendiyan li ser dahatên petrol û gaza xwezayî pêvajo bi tevahî rawestand.

Piştî têkçûna civîna 4’ê çileyê, HTŞ’ê, DAIŞ û komên girêdayî dewleta Tirkiyeyê êrîşî taxên Kurdan ên li Helebê kirin. Ev êrîş li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê belav bûn. Ne tesaduf bû: bi peymana di navbera Îsraîl û Şamê de li Parîsê, armanc ew bû ku firotina Başûrê Sûriyeyê ji rojevê were derxistin. Peyam zelal bû: “Maseya aştiyê hilweşiya, şer li qadê berdewam dike.”

Rola Gel û Berxwedanê, di vir de girîng e. Bi van êrîşan re ku rûxmê hemû tiştî şandeya Rêveberiya Xweser çû Şamê ya 19’ê çileyê, tu encam derneket û hikumeta demki ya Şamê û dewleta Tirk nêzî lihevkirinê û agirberstê nebûn. Li ser vê esasî Rêveberiya Xweser û Fermandariya QSD’ê banga seferberiyê li hemû gelê Kurd kir. Bêguman bangek e ku gel ne tenê barê şer hilgirin di heman demî de gel bibe cewhera berxwedanê. Ango rola gel nebe temaşevanek pasîf; bibe berxwederek aktîf û parazvanê paşeroja xwe. çapemeniya Ereb û Tirk, di vê pêvajoyî de propagandaya şer a desthiladariyan adeta ji nû ve afirandin. Daxwazên di serî de gelê Kurd, civakên Durzî û Elewiyan krîmînalîze kirin, “Xweseriyê” wek e gef û xeteriyê pêşkeş kirin. Weşangeriyeke ku şûna aşitiyê biparêze, zimanê şer rewa kir. Zimanê weşanê ku divê şer bide dawîkirin be, ango zimanê ku divê vîna gel naskiribûya, rastiyan bide nîşandan û yê aşitiyê bûya. Lê li şûna vê zimanî, zimanê derew û civakan li hember hev dike dijmin bijartin. Niha tiştê li Dêrazor, Reqa, Tebqa û Helebê dibe ev e. Ereb ji ber van zimanê manîpulatîf a ragihandinê kolan bi kolan li Kurdan digerin da ku komkujiyan pêk bînin.

Rastiya herî berbiçav a îro ev e: Koalîsyona dijî-DAIŞê, bi serokatiya Amerîkayê, bi van êrîşan bi bandor li kêleka DAIŞ’ê cih girt. Ev hevpeymanî ku ji bo tepeserkirina têkoşîna gel a ji bo azadiyê tê bikar anîn, armanca xwe ya damezrandinê înkar kiriye. Koalîsyona ku li dijî DAIŞ’ê hatiye avakirin, ketiye rewşek ku êrîşên DAIŞ’ê rewa dike. Ev ne tenê nakokî ye; ew xiyanetek e ku dê di dîrokê de bimîne.

# Xerîb Hiso: Yekrêziya Kurdan ne ji ber tirsê ye, istratejiyeke

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku yekrêziya gelê Kurd ne ji ber tirsê ye, lê belê pilaneke istratejîk a Kurdan e û got, "Doza gelên Sûriyê û bidestxistina mafê wan pêktê dema ku doza gelê Kurd li Sûriyê çareser bibe. Herwiha niha bingehê kongreyeke netewî ya Kurdistanî amade ye, bila sala 2026'an bibe saleke Kurdistanî."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 15'ê Çile de civînek di navbera PYD'ê û ENKS'ê de ji bo guftûgokirina rewşa heyî û bilindkirina asta yekrêziya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, li Qamişlo hat lidarxistin. Derbarê heman mijarê de hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Xerîb Hiso bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Di rewşa êriş û gefên ku tên li ser herêmê û gelê Kurd de, hem jî piştî kiryarên hikumeta demkî li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, armanc ji lidarxistina civîna di navbera PYD û ENKS'ê de çi bû?**

Ev civîna ku di navbera me û biraderên ENKS'ê de çêbû, li ser daxwaz û pêşinyara me bû. ENKS'ê dibe hevkarek di şandeya Kurdî de ya ku di encama Konferansê Yekhelwestiya Kurdî de hate avakirin. Armanca me ew bû ku em destpêkê rewşa heyî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev re binixînin. Di serî de pêkanîna êrişa li ser Şêxmeqsûd û Eşerefiyê, hem jî bêdengiya hêzên navnetewî, li kêleka van xalan jî yekrêziya Kurdî. Êrişa li ser gelê Kurd ên her du taxên Helebê siyasetek bû ku fitneyê di nabera gelê Kurd û Ereb de derkeve, herwiha Kurdan lawaz bikin, lê belê gelê Kurd berxwedaniyeke bêhempa raber kir. Hikumeteke ku qaşo hikumeteke xwe fermî dibîne êrişeke wiha bi hezarên çeteyan êrişî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Me yekrêziya gelan bingeh girt, di heman demê de rêxistinkirina diyalogê di navbera gelên Sûriyê ji bo çareserkirina doza gelên Sûriyê, doza gelên Sûriyê û bidestxistina mafê wan pêktê dema ku doza gelê Kurd li Sûriyê çareser bibe. Di civînê de ENKS'ê jî xwedî nerîneke hebeş bû têkildarî geşedanên ku çêdibin. ENKS'ê jî daxuyanî li ser rewşa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê da, hem jî kiryarên hov şermezar kir. Di encama civînê de me tekez kir ku peymana 10'ê Adarê peymaneke sereke ye, divê were kargêrîkirin, herwiha divê ji xala 1'ê ve were destpêkirin ne ji xala çaran a peymanê. Di heman demê pêwîst e peymana 1'ê Nîsanê were pêkanîn, hemû hêzên leşkerî ji taxan derkevin û gel xwe bi rê ve bibe. Civîna me ne tenê bi ENKS'ê re bû, lê belê roja din me 7 partiyên Kurdî din jî dîtin û rewş nirxand, mijar kongreyê netewî hat nîqaşkirin. Em ê bi partiyên pêkhateyên Ereb, Aşûr û Suryan re jî civînan li dar bixin, ji ber ku gavên wiha xwedî girîngiyeke mezin e.

**-Hin alî dibêjin çima heya niha lêvegereke Kurdî piştî lidarxistina Konferansa Yekhelwesta Kurdî nehatiye avakirin û çima Şam pêşwaziya şandeya Kurdî nake?**

Piştî lidarxistina Konferansê Yekhelwestiya Kurdî, şandeyek ji tevahiya partiyên Kurdî hat avakirin, ev şande xwedî berpirsiyariyeke ew dibe muxateba doza Kurdî li Sûriyê, hem jî lêvegereke ji bo gelê Kurd. Şandeya Kurdî nameya hevdîtinê ji bo hikumeta demdî rêkiriye, lê hîna bersiv ji Şamê nehatiye. Dema ku hevdîtin bi Şamê re were kirin êdî şand ji Şamê bizivire û komîteyan ava bike. Ew ê komîteya şêwirmendiyê ava bibe, ev komîte wê ji komîteyên hiqûqî, ya jinê, ya ciwanan, ya rewşenbîran û hwd… pêkwere. Di dema heyî de lêvegera Kurdî ji bo çi ye? hîna şande neçûye Şamê, xalên belgenameya konferansê, hem jî xalên wê yên girêdayî Sûriyê û doza gelê Kurd, bi Şamê re par ve nekiriye. Sedema pêkneanîna hevdîtinê jî siyasete hikumeta demkî ya li hemberî gelê Kurd e, li Sûriyê du hikumet hene, hikumeteke şeklî ye û hikumetek kûr e, hikumeta kûr û veşartî dewleta Tirk. Dewleta Tirk destwerdanê di her tiştî de dike, ew xwediya biryarê ye di Sûrûyê de. Tevî ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi pêşengitiya Rêber Apo tê meşandin, jî dewleta Tirk dixwaze pirsa Kurdî derveyî sînorê destûrî di komareke demokratîk çareser bike, ev yek nayê qebûlkirin. Li Sûriyê jî dewleta Tirk dixwaze tecrûbeyeke wiha bi Ehmed Elşeri bide meşandin. Ji ber vê sedemê me dît ku Şeri mersûmek derxist ji bo gelê Kurd, ev ne ji biryar û gotinên Şeri in, mersûma dewleta kûr a Tirk e, rast e biryar ji Şamê û ji devê Şeri derket lê bi şêwirmendiya Tirkiyê derketiye. Doza Kurdî li hemû parçeyên Kurdistanê dozeke adil e, gelê Kurd ji bo vê dozê jî têkoşîneke mezin daye meşandin. Li Tirkiyê, Sûriyê, Îran û Îraqê gelê Kurd yekrêziya xaka wan welatan parastiye. Tu nêta gelê Kurd a parçekirin tuneye, têkoşîn û tişta ku dimeşîne dide tekezkirin. Gelê Kurd yekrêziya gelan, civakbûyîn û demokrasiyê bingeh digire û dibêje pêwîst e doza Kurdî di çarçoeya destûrekî demokratîk çarser bibe. Doza gelê Kurd bi gotinan çarser nabe, lê belê mersûma ku derket, armanc jê bû ku kiryarên li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêkhatin, werin veşartin. Li Rojavayê Kurdistanê xwediyên Kurdan derketin, şandeya Kurdî heye, gelo çima Şeri banga şandeyê nake ji bo hevdîtinê pêkbînin? Û çima berî êrişên hovan li dijî taxên Kurdan li Helebê ev mersûm derneket? Beşar Elesed berê digot Kurd pêkhateyên resen in di Sûriyê de ne û gotinên xweş digotin, lê piştre komkujî û destdirêjî li gelê Kurd kir. Şeri jî got Kurd biryayên me ne û di çavên me de ne, lê çi ki? Li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê komkujî pêkanîn, em vê biratiya li ser xwînê nabînin, birtiya rast di destûran de ye. Gelê Kurd ne penaber in û hatine Sûriyê ew gelekî resen e û xwedî şaristanî ye.

**-Pêkanîna hevrêziya Kurdî li Rojava û hemû parçeyên Kurdistanê wê di siberojê de roleke çawa pêkbîne di warê parastina gelê Kurd de?**

Yekrêziya gelê Kurd di vê serdemê de gelekî girîng e, Kurd li ser asta cîhan û herêmê miletekî hevgirtî ye. Rast e Kurd di nav çar welatan de di encama siyasetên qirkirin de bi hevpeymanên wekî Lozan, Saykis-Piekot, Cezair û hwd hatine parçekirin, ruxmî berdewamiya lihevkirinên ku li ser wan tên îmzekirin jî, gelê Kurd nêzî hev e. Nimûne li Rojavayê Kurdistanê dema ku konferans li Qamişlo di 26'ê Nîsana 2025'an de hat lidarxistin, zemîneke xurt ji bo hevrêziya Kurdî û kongreyeke netewî hat avakirin. Banga yekrêziya gelê Kurd ne ji ber tirsê ye, lê belê hevrêziya gelê Kurd pilaneke istratejîk e. Ew xwedî istratîjiyeke hevbeş in û yekrêziya Kurd hebe, hem jî diyalog di nabera wan de hebe, serkeftin hertim dibe şensê me be. Niha zemînê mala Kurdî amade ye, bingeha komîteyan ji bo kongreyeke netewî ya Kurdistanî jî heye. Di demê pêş de wê komîte xebatê bidin meşandin, wê bernameyekê sazûman bikin û serdanda partiyên Kurdistanî bikin. Bila sala 2026'an bibe saleke Kurdistanî. Divê partiyên Kurdî bi erk û misyona xwe rabin eger em erka xwe bi cih neyînin em ê li hemberî dîrokê bên şermezarkirin û rastî bobelateke mezin werin. Lewma jî pêwîst e her aliyek bi cidiyetekê û helwesteke niştîmanî nêzî mijara yekrêziya Kurdî bibe da ku em di warê siyasî, dîplomasî û parastina berjewendiyên niştîmanî em hevrêziya xwe roj berî roj pêkbînin.








# Kurdan bi berxwedaniya xwe destanên lehengiyê nivîsandin (1)

Ji berxwedana Kobanê ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê û heta berxwedaniya Bendava Tişrînê, gelê Kurd li hemberî hêzên tarî û dagirkeran destanên lehengiyê nivîsandin.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**



Dema Kobanê û Bendava Tişrinê tê gotin berxwedan gelê Kurd li hember çeteyên DAIŞ'ê û dewleta Tirk a dagirker tê hişê mirovan. Di kobanê de gelê çar parçeyên Kurdistanê bûn yek û di Bendava Tişrînê de helwesta berxwedanê yê şervan û tevahî gel û pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn yek.

**Berxwedana Kobanê di dîroka cîhanê de hat nivîsandin**

15'ê Îlona 2014'an, çeteyên DAIŞ'ê bi hevkariya Tirkiyê dest bi êrişên li ser Kobanê kir. Di wê êrişê de bi hezaran çete ji tevahî cîhanê beşdar bûn. Bi dehan şervanan li taxên Kobanê li hemberî xeteriya DAIŞ`ê li berxwedan. Berxwedana şervanan cîhan neçar kir ji bo Kobanê rabe ser piyan. Her ku dorpêça li ser Kobanê teng dibû, piştgiriya şervanan jî zêdetir dibû. Di Cotmeha heman salê de dema ku DAIŞ gihaşt sînorê bajêr, bi hezaran Kurdên ji herêmên cuda yên Bakurê Kurdistanê li ser sînor kom bûn û piştgiriya berxwedanê kirin. Di pêvajoya berxwedanê de jî seferberiya ku Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan ragihand û bangawaziyên wî li civaka Kurdistanê ku Kobanê biparêzin, guhertineke dîrokî di şerê "çarenûsî" yê li Kobanê de çêkir. Herwiha giropek ji Gêrîla ji Çiyayên Azad daket û tevlî berxwedanê Kobanê li dijî DAIŞ'ê bûn. Kobanê bi ser ket û pişt li DAIŞ'ê hate şikestin. Piştî 4 sal di ser rizgarkirina bajarê Kobanê re derbas bûn, Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) di Adara 2019`an de DAIŞ li bajarokê Baxozê di warê erdnîgarî de têk bir.

**Gelê cîhanê piştgiriya Kobanê kirin**

Gelên bi dehan welatên Asya, Ewropa û Amerîka Latîn bi hevbendiyeke enternasyonalîst piştgirî da wê berxwedanê. Herwiha roja 1'ê Mijdarê wekî Roja Piştgiriya Kobanê ya Cîhanî hat ragihandin. Bi milyonan kes ji ol, mezheb û netewên cûda ku alên YPG û YPJ'ê hildan û ji bo silavkirina berxwedana Kobanê daketin kolanan. Bang li civaka navdewletî kirin ku destwerdana lezgîn bikin û piştgiriyê bidin gelê Kurd. Xwepêşendêran hêzên siyasî û dewlet jî neçar kirin ku li hember hovîtiya DAIŞ'ê bêdeng nemînin.

**Gelê Kurd di berxwedan Kobanê de bûn yek**

Gelê Kurd di berxwedaniya Kobanê li dijî DAIŞ'ê de bûn yek. Her çar parçeyên Kurdistamê bûn yek û piştgiriya Kobanê kirin. Herwiha ciwan ji Çar parçeyên Kurdistanê daketin û tevlî Şoreşê bûn û mohra xwe di berxwedaniya Kobanê dan. Gelê kurd ji zarokan heta mezinan 133 rojan bi şev û roj li ser sînor nobet girtin. Ciwanên kurd di pêşengiya Yekîtiya Parastina Jin (YPJ) û Yekîtiya Parastina Gel (YPG) 133 rojan li dijî hovitiya DAIŞ'ê sîng bi sîng li berxwedanek pêhempa nîşan dan. Bedena xwe li pêş êrîşên DAIŞ'ê kirin mertal û destûr nedan ku DAIŞ Kobanê têk bibe. Arîn Mêrkana fedayî, çalakiyek fedayî kir û xwe di dijmin de teqand ji bi parastina Kobanê û bû sembola jina fedekar di cîhanê de. Nêzî 12 sal berê li aliyekî rêveberiyên otorîter û zordar, êrişên hovanê yên li dijî nirxên mirovahiyê pêş xist û bi hezaran mirov qetil kirin. Li aliyê din jî, vîn û rûhê tevgera kurd bi berxwedanek bêhempa, ji bo azadiya jinan, ciwanan, gelan, baweriyan, modela jiyaneke nû, felsefeyek nû û dîrokek nû têkoşiya. Di 39 salên dawî de Erdnîgariya Kurdistanê, şahidiya berxwedanek dîrokî dike. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî bi taybetî di 14 salên dawî de di aliyê berxwedan, avakirina jiyan, felsefeyek nû û rêveberiyek nû de dîrokê dinivîse. Îro çavê hemû cîhanê li ser pêşketinên vê axê ne. Yek ji berxwedana dîrokî û vîna ji pola ku hemû gelên cîhanê bûn şahidê wê berxwedana Kobanê ye.

**DAIŞ'ê hêvî dikir ku gelê herêmê qir bike**

Di sedsala 21'emîn de DAIŞ'ê bi alîkarî û piştgiriya hêzên navneteweyî û herêmî, li dijî gelên herêmê hovîtiyeke mezin û komkujiyên giran pêk anî. Xwestin ku bi destê DAIŞ'ê hêviya gelan, xeyalên azadiyê yên gelan bifetisînin, tune bikin. Li Şengal, Kerkûk, Misûl û gelek bajarên din DAIŞ'ê komkujiyên mezin pêk anîn. Lê li dijî vê hovîtî û komkujiyê di serî de gelê kurd û dostên gelê kurd, bi wê berxwedan, têkoşîn û serfiraziyê, pêşengiya sedsala azadiyê ya nû kir. Li dijî DAIŞ'ê li Kobanê 133 rojan berxwedaneke mezin nîşan da û Kobanî rizgar kirin. Berxwedana li dijî DAIŞ'ê, serkeftina ku hate bidestxistin, serfiraziya gelan, jinan, baweriyan bû. Encama nirxên hevpar ên mirovahiyê bû. Çirûska berxwedana Kobaniyê îro bi dirûşma Jin, Jiyan, Azadî li Rojhilata Navîn û li cîhanê deng vedide û bûye dirûşma azadiyê. Gelên cîhanê mil dan û xwedî li berxwedana Kobaniyê derketin û hemû îmkan seferber kirin. Gelên cîhanê, nivîskar, rewşenbîr, xelatgirên Nobelê û rêxistinên civaka sivîl, 1'ê Mijdara 2014'an wek Roja Piştgiriya bi Kobaniyê re ragihandin. Ruhê Kobaniyê bû ruhê azadiyê li her aliyê cîhanê û hêviyeke mezin da gelan.

**Dijminahiya li dijî Kobanê didome**

Îro dema em li geşedanên li ser Kobanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dinêrin, em dibînin ku ji wê rojê heta niha hem hêzên navneteweyî hem jî hêzên herêmî, her tim dijminahiya serfiraziya Kobaniyê kirin. Di ser berxwedaniya Kobanê re nêzî 12 sal derbas bûn lê hêzên tarî û çeteyên wek DAIŞ'ê li Efrînê, Girê Spî û Serêkaniyê ne. DAIŞ di kiras û rengên cuda de gef û êrişên xwe berdewam dikin. Nexwesim li dijî hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê û dewleta Tirk ku hewl dida di bin perdeya îslamê de, xîlafeta Osmanî vejîne, bi bin ketin. Ji DAIŞ'ê heta bi dewleta Tirk, ji Ebû Bekir El-Bexdadî heta bi bavê wan ê ruhî Erdogan, rijandina xwînê û derbkirina aramiya herêmê, ranewestiya ye. Em dibînin ku Tirkiye ji wê rojê de nikarî têkçûna hevalbendê xwe DAIŞ'ê li pêş çavên xwe li ser destê şêniyên herêmê ragirta. Tirkiyê sembola Cîhanî ya berxwedanê 'Kobanê ' armanc digire. Tirkiyeyê bi balafirên bêmirov bi dehî caran herêmên sivîlan ên Kobanê hedef girtin. Bi vî awayî tiştê ku çeteyên DAIŞ'ê li Kobanê nikarî pêk bîne, Tirkiyeyê li pêş çavên civaka navdewletî dixwaze bibe serî. Îro êrîşên li ser Kobanê û li ser hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê her wiha li ser Şengal û Mexmûrê didomin. Ev nîşan dide ku tişta DAIŞ'ê bi dest nexist, artêşa Tirkiyeyê dixwaze bi dest bixe. Lê êdî Kobanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyêne weke berê ne wê li berxwebidin.

**Bendava Tişrînê bû bendava Şehîdan û berxwedanê**

Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê ji aliyê aborî, siyasî û leşkerî de gelekî girîng in. Pira Qereqozax li ser rêya M4 a navdewletî ku herdu aliyên çemê Firatê bi hevre girê dide, ji bo bazirganiya herêmê jî girîng e. Bendava Tişrînê jî pêdiviya piraniya kehrebê ya Kantona Firatê û Minbic, beşek Heleb û hinek deverên Tebqayê û Cizîrê pêk tîne. Dîsa ji bo çandiniyê jî çavkaniyek sereke ye. Ji bilî van taybetmendiyan herdu dever ji bo ewlekariya herêmê di asta stratejîk de ne. Li gorî pisporan, hêzên ku li van deran serwer bibin, wê karibin tevahiya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî kontrol bikin. Dewleta Tirk a dagirker jî, dema HTŞ'ê berê xwe da Şamê, bi van hesaban xwest Tişrîn û Qereqozaqê dagir bike û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Rayedarên Tirkiyeyê bi daxuyaniyên xwe ev yek eşkere dikirin. 2024–2025 Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaq bûn armancên êrîşên dewleta Tirk. Di 8'ê Kanûn a 2024'an de li Bendeva Tişrînê dest bi êrîşan kirin. li hemberê wan êrîşan ji nû ve avakirinek bihêz û hevgirtî li benda gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bû. Êrîşên Çeteyan ne tenê li ser çeperên leşkeri bû, lê li ser binesaziya heremê, gund, nexwaşxane, îstasyonên avê û malên gel hatin hedefgirtin. Şerê ku li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê hat meşandin ne şereke leşkerî bû, Şerê taybet û şereke derûnî ku dixwastin hêviyên gelê heremê tune bikin. Armanc ew bû ku bi van êrîşan nûfûsa heremê mehkûmê taritiyê bikin. Lê bele îradeya gel ew tarîtî şikand û carekedin bi hevgirtin û berxwedaniya xwe xwe dan ispatkirin.

**Rêveberiya Xweser banga Şerê Gelê Şoreşgerî kir**

Di 8'ê Çile de li ser banga Rêveberiya Xweser bi hezaran şêniyên bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo av, ax, enerjî û destkeftiyên xwe biparêze li Tişrînê dest bi nobetê kirin. Li gel êrîşên li ser bendavê, kerwanên gel ji bo biçin bendavê ava kirin, gelek caran rastî êrîşan hatin. Rûxmî hemû êrîşan jî gel ji doza xwe venegeriya bi israr xwe gihandin bendavê. Her roj derdora bendavê ji aliyê balafirên şer ve dihatin bombebaran kirin. Tevî vê yekê jî bi sedan kes ji bo piştgiriyê bidin çalakiya nobetê bê navber diçûn qada bendavê. çalakiyên ku 8'ê Çileyê ve destpê kir 118 rojan dom kir.

**Berxwedana gel dagirker têkbirin**

Berxwedana Dîrokî ya şervanên YPG -YPJ- QSD'ê û ya Gelê herema Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ya 118 rojan bi dayîna gelek berdelên mezin domkir. Piştê ku Rêveberiya xweser bang li gelê herêmê kir. Pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan, Êzîdî û hwd.. ji 7 heta 70 salî herikîn bendava Tişrînê parastina av, ax û enerjiya heremê kirin. Rûxmê ku her cûre êrîş jî pêk dihatin çekên ku heta niha li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê nehatibûn karanîn ji aliyê dewleta Tirk û Çeteyên wê ve li Ser bendavê hatin bikaranîn. Balafirên bê mirov, çekên giran û bi çekên kîmyewî kerwanên gel kirin hedefê xwe. Gel di nav wan êrîşan de bi îradeyek xort mesajên giring da dewleta Tirk a dagirker ku gotin "Em ne yek deqe û yek kêliyek ranewestiyan. Em carek din dûbare dikin em dev jî bendavê bernadin. Emê piştevaniya QSD'ê bikin û emê berxwedana xwe bidomînin. Em ê li vir bin. Em ê ruhê şoreşê ya 19'ê Tîrmehê biparêzin." Rixmî ku bi dehan Şehîd û bi sedan birîndar hebûn, lê dest ji berxwedaniya xwe bernedan.

**118 rojên berxwedaniyê gel û şervanan biserket**

Bi saya berxwedana gelê heremê û îmzekirina hevpeymana 10'ê Adarê ya di navbera Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdê û Rêveberiya demkî ya Hikûmeta Şamê Ehmed El Şara ve ku ji 8 xalan pêk dihat îmzekirin. Di xalalên hevpeymanê de nûnertiya wekhev a bawerî û nasnameyên niştimanî yên gelê Sûriyê, dabînkirina xizmetguzariyên ewlekarî û giştî, vegera bi ewle ya koçberan, rawestana li hember axaftinên nijadperestiyê û helwestên ku dê nakokiyan derxînin û misogerkirina agirbestê li seranserê welat. Di encama nobeta gel û berxwedana dîrokî ya şervanan de êrîşên li ser Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaxê hatin rawestandin. Rêveberiya xweser ya demokratîk bi daxuyaniyek çapemeniyê raya giştî re ragihand. ku "Berxwedana gel ser ketiye".

## Bîra Civakê



### Di civakê de pirsgirêka ziman

**Ehmed Hesen**

Nîşan û heyînên herî dîyarde ku mirov û sewalan ji hev cuda dikin bêguman ziman û raman e. Heke ziman bi pêş neketa raman jî bi pêş nediket. Çawa ku dara xurmeyê li Swêd û Norwêcê şîn nabe, ku şîn bibe ber nagire, û ber bigire jî tehm û çêja wê nîn e. Mirov jî wisa ne. Yanî her qewm û neteweyek rengê axa welatê xwe digire û bi her awayî dişibe welat û nijada xwe, zimanê mirov a rast nasnameya gelekî civakekê temsîl dike û ziman nebe di heman demê de nasnameya civakî ya hebûnî ji dest dide. Di komên civakî yên destpêka dîrokê de girîngiyeke mezin a pêşxistina zimanê zikmakî nexasim ê devokî cih girtiye û nifş bi nifş herikiye bîra civakê, ziman ji amûreke madî ya danûstandina di navbera mirovan de zêdetir hebûneke çandî ya civakê raber dike. Çawa ku zarokek dema nû jidayîk dibe, di serî de bi dengê hebûna xwe bi derdor dide hîskirin, ziman jî di jiyana mirov de vê hebûna destpêkê ya xwenaskirina mirov diparêze. Di çi civakên ku hatine asîmîlekirin de tê dîtin ku di serî de destdirêjîya li ser zimanê wê civakê hatiye kirin û bi ziman û jiyana çandeke xerîb hatiye formulîzekirin, ev rêbaza asîmîlekirina zimanan bi şêweyên weke windakirina peyv û hevokên zimanê resen, bikaranîna peyvên biyanî jî yek ji sedemên sereke yên pişaftina kokên zimanan e. Civakên ku di nava gel û zimanên din de reseniya zimanê xwe yê zikmakî neparêze ew civak reseniya xwe jî ji dest dide û tê windakirin, çendîn civakek karibe hîmên parastina ziman bingeh bigire û li ser wê esasê jî karibe nasnameya xwe biparêze, wê bi vê re azadiya xwe jî îfade bike. Ziman navgîneke hilberînê û heyînîyek zindî ye wek zarokek ji diya xwe dibe tê dinyayê, mezin dibe û eger ku baş neyê xweyîkîrin, bêguman wê demê ew ziman dimre.

Mirov dikare jî bo vê yekê çend mînakan nîşan bide; wekî zimanê Sumerî, Babîlî, Asurî û çend zimanên dinê, niha ev ziman yan mirine, yan jî li ber mirinê ne. Ziman ne bi tenê hêmana ragihandina di nav mirovan de ye, herweha ji bo hevotina nifşên nû rênîşan e û bingeha jiyaneke rûmetdar Feylezofê Birezîlî Paulo Freîre di gotineka xwe de balê dikşîne ser girîngiya zimanê zikmakî û dibêje; 'çeka netewa serdest ya herî mezin, ziman e. Ew neteweyê bindest, bi çeka ziman tê kûştin, çimkî bi mirina ziman ne yek kesek, lê bi mirina ziman re neteweyek dimre!

Mirov dikare bi vê yekê destnîşan bike ku civak dikare bi riya xwedîderketina li ziman hemû bîr û dîroka civakî di nava xwe de hembêz bike û pê re bidome.

Lê di roja îro de ji ber zêdebûna pergala zimanperestiyê ya ku heya kêliya dawî hebûna civakî dimije, gelek netewe û qebîle hatine asîmîlekirin yan jî bi tunekirina çandî re rû be rû ne, taybet di roja îro de jî zimanên weke aramî, esyewî, babo, xuysan û gelek zimanên dîtir li ber xeteriya asîmlasyonê ne, ji ber ku axêverên wê yan berê xwe dane zimanên dîtir an jî di navbera zimanên biyanî û peyvên wê de tên qirkirin.

Ya rastî civakek çiqas lêvkirina devokî û nivîskî ya zimanê xurtir bike, peyvên biyanî bikar neyne, ewqas jî dikare zimanê xwe bike çavkaniya pêşketinê, di heman demê di hemû nivîsên siyasî, çandî, aborî û hwd de divê zimanê dayîkê bibe bijareya sereke ya pêşketinê.